

kovara hunerî, çandî û lêkolînî ya kurdên anatoliyê

bîrnebûn

88
2024





Tidskriften utkommer 3 nummer per år.
Çar mehan carekê derdikeve.
Utges av Apec Förlag AB
hejmar 88 / 2024
Ansvarig utgivare: Ali Çiftçi
Editor: Ali Çiftçi, Heciyê Gulê, Muzaffer Özgür

Koma hevkarên vê hejmarê
Ali Çiftçi, Seyfî Dogan, Nuh Ateş, Mem Xelîkan,
Muzaffer Özgür, Memduh Selim, Bêrivan Xizênzêr,
Adem Özgür, Rohat Alakom, Prof. Dr. Haci Akman
Mehtab Îdelf, Xizan Şilan, Bilal Celepli, Newal Iskan,
Dr. Mikailî, Bilal Celebli, Rojvan Enes

Belavkirin / Distribution:
Ewropa: Muzaffer Özgür
Bîrnebûn
Postfach 900348, 51113 Köln / Almanya
Tfn: 0049-172 298 24 51

Numra kontoya li Swêdê:
(Bîrnebûn) bankgiro: 402-2224
Ji bo aboneyên li derveyî Swêdê
APEC, "Bîrnebûn" Bankgiro - Stockholm / Sweden
BIC/SWIFT: DABASESX
IBAN: SE23 1200 0000 0123 5020 6874
Çap / Baski: Apec-Tryck AB

Biha/Pris:
Europa: 5 Euro
Türkiye: 30 TL
Abone ji bo du salan
Swêd: 400 SEK -Almanya 50 Euro
Welatên din ên Ewropayê: 50 Euro

Medya Kitapevi
Bekar Sokak No: 7, Giriş kat.
Beyoğlu / İstanbul / Türkiye

Adress
Navnîşana li Swêdê
Apec
Mjölmarstigen 1
SE 163 41 Spånga/Sverige
E-post: info@apetryck.se
Internet: www.birnebu.eu

Her nivîskar bersive nivîsa xwe ye.
Mafê redaksiyonê heye ku nivîsên ji Bîrnebûnê re tîn,
sererast û kurt bike. Ger nivîs çap nebin jî, li xwedîyan
nayên vegeandin. Ji ber stîl û devokên taybet em
dest nadin hinek nivîsên nivîskarên xwe.

Waqfa Kurdên Anatolîya Navîn li Swêdê û
Komela Ziman li Almanayê piştgirên kovarê ne.

bîrnebûn

88 2024

Grafika berg: Runak Resulpur

ISSN 1402-7488

bîrnebûn 88/2024

Naverok

Ji bîrnebûnê	4	Alî Çiftçi
Rêwîyê Helbestan; Mem Xelîkan	6	Memduh Selim
Di rojên înzayê da eleqeyên baş hebûn	9	Adem Özgür
Kilamên me, Qamyona Îzzet	12	Mem Xelîkan
Hewî	14	Bêrivan Xizêmezêr
Çend kilamên dila ji gundê Mikaila	19	Dr Mikailî
Medyaya civakî û diasporaya kurdî	23	Haci Akman
Huner	39	Muzaffer Özgür
Ken	45	Rojvan Enes
Bayê vejîné	50	Xizan Şilan
Maf û Axa	52	Newal Iskan
Koçberî û bêwelatî: Di navbera du welatan da kurik bûn	56	Adem Özgür
Romanek ji edebiyata kurdên Anatoliyê	63	Rohat Alakom
Henek	70	Seyfi Doğan
99 gotinên Albert Einstein	71	Wergera ji almanî: Nuh Atêş
Qerfo	73	Seyfi Doğan
Quto	74	Seyfi Doğan
Helbest	75	Seyfi Doğan
Sirî zivîrok	76	Bilal Celebli
Kurdîstana bê nasname	78	Mehtab Îdelî

Ji Bîrnebûnê

Rêwîyê Helbestan

Mem Xelîkan

Memduh Selim

Mixabin li welatê kurdan, li cihê kurd lê dijîn politikayeke asîmilasyonê/pişavtinê mezin berdevam dike. Ev politîka sed salan zêdetir e berdevam dike û roj bi roj girantir dibe. Bi giranî li ser nasnameya kurdan, çanda kurdan û li ser zimanê kurdî, inkar û xirabiyê çêdike. Tunebûna zanîngên kurdan, li fermî qedexekirin û talûka ceza û hepsê xirabiyê dike. Politîkayên pişavtinê wek lehî bi ser zimanê kurdî û çanda kurdan da derbas dibe. Lê dîsa jî, berxwedaneke mezin heye. Bi qîreta şexsî, bi qîreta merivên taybet li ber wê lehîyê bendeke çêdikin. Kuvetê ji çanda kurdan ya qedîm, zimanê kurda yê dewlemend digirin.

Polîtîkayên pişavtinên qirêj, li ser kurdên dervayî welêt, bi taybetî li ser kurdên Anatolîya Navîn gelekî bandoreke xirab çêdikin. Ji sed salan vir da, ji welat dûr, nasname û zimanê xwe parastine. Lê peşerojê talûkeke

mezin xuya dike. Mem Xelikan, demeke dirêj e bi xebat û karên taybet li ber wê pişavtinê bendeke mezin çêdike. Nêzikî 30 salan li ser çanda kurdên Anatolîyê dixebite. Bi nivîsandina kurteçîrok, hekat û serpehatî, yaranî û henekan bi berevkirina stran û hekatên stranan û bi nivîsandina gotinên mezinan û li gel wanan hemuyan bi helbestan rih û can dide çanda kurdên Anatolîya Navîn. Ji bo wê Mem Xelikan helbestvan, lekoliner û gerokê çanda taybet, çanda li rêya wenda bûnê, li ber çûyinê, rihê xwe û canê xwe kiriye bendeke pîroz.

Mem Xelikan helbestvan e, helbestvanekî hêja ye, helbestvanê xeyelan e. Helbestvanê deşt û zozanên kurdên Anatolyayê ye. Rêwiyekî kurdî ye, rewîyekî evînê û xeyalan e. Mem Xelikan, kedkarê beravkirina hekatan, stranan û çîrokan ne. Bi kurtasî, helbestvanê evînê, helbestvanê welatê xwe û xelkê xwe ye,



kedkarê çavkaniyên çanda kurdên Anatolîyayê ye. Bi gotina Memê, helbesta Memê “her dem di bilûra şivanekî de dilorîne”.

Sala 1997an virda di kovara Bîrnebûnê de gelek berhemên Mem Xelîkan hatine weşandin.

Jîyana kovara Bîrnebûnê da keda Mem Xelikan gelekî zêde ye. Ji bo devlemendiya berhemên çanda KAN were nasandin, ji bîrnebe, li pêşerojê bijî û pêşva here keda Memê cihekî mezin digire.

Li ba KAN kurdî nivîsandin û xwandin, ne zêde be jî van demên paşiyê destpêkir û pêşva tere. Lê bi kurdî helbest, çîrok û roman nivîsandin demên dawî da yek yek xuya dikin. Nav kurdên Anatolîyê da dema bi kurdî helbest nivîsandin tê gotin Mem Xelikan cara pêşî tê bîra meriv. Mixabin hevalên bi kurdî helbest dinivîsin tilîyê destekî derbas nakin. Mem Xelikan heta niha du kitêbên helbestan derxistin.





Pirtûka xwe ya duyemîn bi navê “Serenad” li weşanxaneya APECê hate çapkirin. Di pirtûkê da nêzi 60 helbest hene. Heval û dostên Memê ji bo wê pirtûkê rojêke destnişanê/imzayê li Ankare/ Enguruyê 04/11/2023 çêkirin. Ev roja nasandinê bi coş û kelecaneke derbas bû.

Nêziki 50 kes mîvan hatin. Mem Xelikan nêzikî saatekê ji bo mîvanan pirtûka xwe ya bi navê *Serenad* imza kir. Nasandin/ imza xelas bû şuva Mem Xelikan, pêşî li ser xebata xwe ya bi kurdî nivîsandinê, bi taybet bi kurdî helbest nivîsandinê axaftinek kir. Li piştî axaftinê du helbestên xwe, ji bo mîvana xwandin, bi dengêkî zîz û ji kurahiya dilê xwe de.

Paşiyê axaftinê Mem Xelikan ve helbestvanekî kurdên Anatolya Navînî din, hevalê hêja Kadir ÇELİK ji Stockholmê, bi bîstokê/ telefonê desta beşdarê bernameya nasandinê bû. Li ser helbesta Mem Xelikan û giringîya bi kurdî helbest nivîsandinê, fikr û ramanên xwe bi axaftineke girîng anî ziman. Paşê, xwadîyê weşanxaneya APECê birêz Ali ÇİFTÇİ dîsa bi bîstokê/ telefonê desta beşdarê bernamê bû û ew jî li ser helbest, kar û xebata Mem Xelikan axaftineke baş kir. Li dawîyê mîvanên hatin bernamê, li ser bi kurdî nivîsandinê, axaftinê û bi taybetî li ser helbestên Mem Xelikan fikr û ramanên xwe gotin.

Dawiye, bername bi çoşake mezin xilas bû.

Kitêba Dr. Fîkret Yildiz:

Di rojên înzayê da eleqeyên baş hebûn

Adem Özgür

ozguradem25@gmail.com

Kitêba nivîskarê Bîrnebûnê Fîkret Yildiz a bi navê “Ankara’da Bir Kürt köyü: Mikaila/İnler/Katrançı”, ji aliyê weşanxaneyê APEC û weşanxaneyê Seksekê hatibû çapkirin. Di vê kitêba ku li ser belgeyên arşîva Osmanî hatiye amadekirin de, pêvajoya dîrokî ya kurdên Anatolîya Navîn bi rêya gundekî hatiye lêkolînkirin.

Beşek girîng a pirtûkê li ser pêvajoya koçberîya kurdên

Anatolîya Navîn bo herêmê dadistê û çîroka jiyana rojane ya gundê Mikaila ya Polatliyê, ji aliyê din ve pêşkêşî xwendevanan dîke.

Di pirtûkê de wêneyên berê û îro yên gundê Mikaila û arşîvên Osmaniyan jî hene.

Dr. Fîkret Yildiz da zanîn ku ji roja ku li ser kurdan xwendiyê û di kovara Bîrnebûnê de nivîsiye, fikra wî ya nivîsandina pirtûkekê li ser dîroka gundê Mikaila hebû



Civîna li Polatliyê



Li Polatliyê beşdarên roja îmzeyê

û got ku ji ber nebûna çavkanî
 û agahiyan xebatên xwe bi salan
 paşxistiye. Li gor Yıldız, destpêka
 koçberiyê di 1691ê da ji Reqqeyê
 de destpê dike.

Dr. Fikret Yıldız di mehên
 dawî de beşdarî sê îmzekirina

pirtûkan bû û bi xwendevanên
 xwe va hate ba hev. Sed û bîst kes
 beşdarî her sê îmzekirina pirtûkan
 bûn û eleqeyek baş hebû.

Rojek li Polatliyê bû. Li wê
 rojê xwendevanên ji Anatoliyê
 jî beşdarê îmzeyê bûn. Ya dudu-



Li Stenbolê, di Kitêbxaneya Medyayê de (Medya Kitabevi)

ya jî li Stenbolê, di Kitêbxaneyaya Medyayê (Medya Kitabevi) da bû. Ya din jî li İzmirê, kafeyeke de hat pêşkeşkirin.

Fîkret Yildiz got ku xwendevanên wî dixwazin bêtir li ser kurdên Anatolîya Navîn agahîyan bigrin: “Çend kesên tirk jî hatibûn û ji bo wana jî ew tiştêkî nû bû. Di derheqê kurdên Anatolîyê da nezanînek heye, agahîyên tevlihev hene. Bo wê gere em zêdetir semîner an kofe-ransan bikin. Va hewce ye. Ji bo eşîr û gundiyên me jî ew tiştêkî xwepesandinê bû.”

Li gor Fîkret Yildiz, gundî tenê li wêne û cîyên qala malbatan dikin, mêze dikin: “Hîn dibêjin te em hindik nivîsandine yan jî



te em nekirinê. Ji bo vê ez niha hin tiştan ji bo çapa nû lê zêde dikim.”



Li İzmirê, kafeyeke de pêşkeşkirina kitêbê



KILAMÊN ME (XIII)

Mem Xelîkan

QAMYONA ÎZZET

Salên 1960î ji herêma me, gundiyeke Karagedîka girêdayîya Golbaşîyê ya Ankarê li Alaman xwandî ye. Ji malbata, mala Elî Garê Tevfîk Ercan. Bi xwedîyê febrîqeya M.A.Nê re têkilîyê çêdike. Bîrîyarê digrin tên li Ankarayê febrîqeyaka M.A.Nê çêdikin. Pirañiya wan qamyonan difroşin kurdên Konyayê. Ew qamyon (Qamyona Sor) li nav kurdên Konyayê meşûr dibin. Dibin nîşana dewlemendîyê. Kurdên heremê jî bi wan qamyonan qezencê û debara dinê dikin.


Her çiqas qamyona sor ji kurdên heremê re bûyibe deryê qezencê jî, bi qezayên trafikê pir

meriyên biqedr û qîmet jî, bi wan qezana jîyana xwe ji dest dan. Bi dû wanan ve pir kilamên şînan hatin strandin. Kilama Horikê, *Qamyona Sor* hwd. Qamyona Îzzet jî yek ji wana ye.

Sarikaya gundekî Canbegî ye. Girêdayîyê Kadinhanêya Konyayê ye. Îzzet gundiyeke Sarikaya ye. Bi qamyona xwe, debara dinê dike. Tê gotin ku, ji alîyê şoferê xwe ve bi al/fêlbazî qezeya trafikê derbas dike û jîyana xwe ji dest dide.

Bi ser wê êşa giran de dayîka Îzzet, li ser wî kilama li jêr, distirê. Ew bûyer û kilama dilşevat, li heremê belav dibe û deng dide.

*Qamyona Îzzetî min madan e
Mêratê çex dibê vê xwedan e
Gundo, Abdilîzzetê min tê da ne
Min got Abdilîzzet were malo*



*Lo lo tu natî malo nav hevala
Eza kincên te bidime kûr topela
Daka kûr bî çi bike bi van qerepagana*

*Bûkê rabe em herin nav mezela
Şîyarî te yî mîna beranî kela
Heta li dêra dinê xwaş mam
Ez yarê patronî xwe nadim merimala*

*Çiya bilind in ser çîyan re
Qamyonê şofera terin di ber re
Ê lê gihêştine hev patronê gunda
Îzzet beg disekine di ser gîya re
Qurbana we me Konya dibên bi heft tewaxa
Nexwaşê min ê belav bûne li yataxa
Meyrik bûka du sala ye
Bisk perçemê ketine ber çava*

*Qamyona Îzzetê têye gîj e gîj e
Gêrmişbêlî girt dûman û mij e
Kê cara ecêbê veng dîtine
Şofer patronê xwe dikuje*

Çavkanî: Serbilind Kanat

Hewî

Bêrîvan Xizêmezêr



Zeynê bi şewqa ku di kûjê pencerê re dayî çavên wê, serê xwe ji ser destê xwe yê mistkirî, ku ji êvarê de di cîhê lêrûniştî de ji xwe re kiribû balgî, bilind kir. Bi wê şewqa ziravik ya ku dayî çavên wê, ji nava fikr û ramanên kûr derketibû. Bi xişînîya ku ji haporlêra mizgeftê bilind bûyî, bi wextê hêsîyabû. Kêliyêkê, guhên xwe mişt kirin û wisa bê deng li hêvîya banga sibê ya ku ji haporlêra mizgeftê bilind bibe, sekinî. Lê wê sibê mela bang nedabû. An jî bang dabû, lê Zeynê bi wan xemên ku bûne kul û ketine nava wê de çûbû, banga nîmêja sibê nebihîstibû. Zeynê çavên xwe li odê, li dîwarên nizm yên di bin kirîşên ku ji ber dilopê belek bûnî û siwaxa dîwaran ya der bi der qeliştî de gerandin. Nivînên wê û Hecî yên ku ji doh

ve li ser sandoqa li jêrê odê qat kirî bûn, hîn jî li cîhê xwe bûn. Zeynê gaveke din di cîhê xwe de bê liv rûnişt. Haya wê ji saetê tune bû. Jixwe di mala wan de saet jî tune bû. Roja wê bi çûyîna Hecî ya bo mizgeftê dest pê dikir, bi girîyê zarokan dewam dikir û bi karûbarên malê jî diqedîya. Zeynê careke din çav li odê gerand, kesereke kûr kişand û rondikên ku bi ser rûyê wê de hatibûn, bi destê xwe ziwa kirin.

Ew bi dengê siwareya ku hatiye pêş derî, ji cîhê xwe rabû, berve derî meşîya, lê ji dilê wê nedihat ku derî veke û wekî berê berve Hecî biçê. Piştî ku dengê gavên Hecî hêdî hêdî bi dûr ketin, Zeynê derî hêdîka vekir. Ji dûr ve û bêdeng, li bejna Hecî ya bêyî ku bi aliyê mala wê ve binêre û derîyê qonaxê ya ku ji pişt xwe ve girtî, mêyzand.

Ya ku li hêvîya hatina Hecî, ne tenê Zeynê bû. Li pişt pencereya qonaxê ya bi ser hewşê ve Tawarek ji li benda hatina Hecî bû. Dema Hecî bêyî ku berve mala Zeynê binêre, berê xwe da mala Tawarekê, Tawarekê mîna ku fermanarê dijminê xwe di ser de tekbirî kêf da. Tawarek bi wê şabûnê bi bazdan berve derî çû. Hecîyê ku li pişt derî solên xwe ji lingê xwe dikirî, bi arezû hembêz kir. Hecî xwe li nava wê pêça û xwest berve oda razanê biç. Lê Tawarekê ew berve odeya rûniştinê rakişand. Hecî xwest tiştinan bêje lê Tawarekê xwe li wî pêça û lêvên xwe xistin devê wî. Bi wî awayî hatin ber pencereyê. Kêliyêkê, xwe li wir birin û anîn û pişt qeretîya wan ya li ber pencerê, hêdî hêdî hate xwarê.

Zeynê hîn jî li pêş derî wisa bê liv sekinîbû. Dilopa xwînê ya ku di rihên wê de mayî, bi wê dîmêna ku di pencerê re ji wê ve xûya bûyî, ji laşê wê kişiyabû. Dinê ji nişke ve li ber çavên wê şêlo bûbû. Mîna ew şeva ku Zeynê bi gurminîya ku ji derî hatî, ji xewa kûr veciniqîbû.

Gurm, gurm, gurm! Metê! Metê!

Zeynê di xwîdanê de ma bû! „Qey tîna agirê sobê hîn jî neşikestibû?“

Bi herdu destên xwe xwîdana li rûyê xwe paqij kir, rûyê wê bûbû pîzot, dilê wê di qefesa sîngê wê de bûbû gilokeke ji êgir! Zeynê hêz da xwe û balgîyê xwe hinekî bilind kir.

„Xewna xêrê be!“

Gurm, gurm! Metê! Metê, derî weke!

Dengê Ehmed bihîst. Dilê wê yê bûbû giloka êgir û di qefesa wê de lêdida. Bi carekê ve xwe bera rehên wê da. Deng ji ber derî dihat, ev ne xewn bû! Ji bo ku rabe ser pîyan hewl da lê nikarî, çend carên din hêz da xwe lê dest û pî li wê sist bûbûn. Kela xwîyê bi ser serê wê de niş bûbû. Di şûna xwe de çarpêkî rûnişt, destekî xwe dirêjî dîwêr kir û bi quweta dîwêr rabû ser pîyan. Hêdî hêdî berve derî meşîya, lê çawa! Demekê, li pişt derî rawestîya. Mîna ku derî li ser wê hatibe kilît kirin û nikaribe veke, li pişt derî bang kir:

„Ehmed! Çi bû? Xêr e?“

Newêribû pirsra tu kesî ji wî bike. Pirsra dê û bavê wî jê bike û bibêje wî, „Bavê te çima bi te re nehat? Dayik û birayê te li ku

derê ne? Ma ew çima bi te re nehatin?“

Bi dengekî nizm î ku wê bi xwe jî zor û zehmet bihistî, ew gotin ji navbera lêvên wê filitîn: „Na! Na! Ev ne xisletê birayê min e. Ku ev دنیا eleg û bêjin bibe jî, ew ê Ehmed vê çaxê û bi tenê heya vir neşîne!“

Eyam mijî bû. Ehmed fanîlekî rîsînî lêbû. Ehmed bi qîr û hawara dayika xwe re, şimika li ber derî xistibû lingên xwe yê biçûk û berve mala meta xwe bazdabû.

Zeynê li pişt derî û Ehmed jî li pêş derî, wisa bê liv wekî ku du peykerên bê ruh bin, kêlîyekê sekinîn.

Ehmed bi dengê vebûna zirzeya(surgu) derî re, bi devmilê fanîlê xwe, rûyê xwe ji rondikan paqij kir. Bi çavên şil û zîq li rûyê meta xwe ya ku li pişt derî ji wî ve xuya bûyî nêrî. Zeynê mîna ku Ehmed ne li wir be, destên xwe li ser sîngê xwe mîna ku li ber kesekî bigere, mist kiribûn û li dûrê dinêrî. Mîna ku kesek li pişt Ehmed sekinî be, awirên xwe noqî mija ku ketiye erdê kiribûn. Ehmed jî bi pişt xwe ve zivirî, li nava mijê nêrî, lê tu kes jê ve xuya nedibû. Zeynê mîna

ku bixwaze berî kêlîyekê ji wan qewimiyên mîna xewnwreşekê şîyar bibe, destê xwe li derî da ku derî bigire. Lê bi destê Hecî yê ku ji nişka ve bi milê wê girtî, bi xwe ve hat.

Ehmed vê carê hawara xwe bire Hecî.

– Apo! Apo! Bavê min mir!

Dema bi siwareyê di nava gund re derbas dibûn, Zeynê, xwe bixwe, heyfa xwe bi birayê xwe dianî:

„Heyfa te mêrî ku tu wisa ji nişke ve ji nav koza xwe biçî! Çi eyamekî ne xweş e! Ji ber mija ku ketiye erdê çav çavan nabînin! Qey gund ji mirovan vala bûye ku, tu kes neçûyê hawara koza birayê min?“

Dema ew gihaştin nava gund, ronahîyên tekûtûk ku li rast û çepê rê bûn, ji wê ve xuya bûn. Ev mija ku dema diket erdê xof dixist dilê mirov li dora şewqa ronahîyan bûbû giloka pêmû, aramî dixist dilê mirov. Xanî, dîwarên kevirî yê hewşan û sipîndarên li nava wan hewşan, bi şewqa ronahîya siwareyê re, mîna leylanokan car xuya dibûn car jî ji pêş çavan winda dibûn.

„Ma hebûna mirov jî ne

tişteki wisa bû? Mirinê meriv di kêlîyekê de tune dikir. Mîna ku te qet li vê dinê nekirî û nexwarî bî. Erê, jîyan ji bo hemû mirovan azmûnek bû, feqet mirin? Mirin çi bû? Mirin azmûna kê ji me bû gelo? Yan mirîyan bû yan ya zindîyan?”

Siwara hêdî bûbû û berê xwe ji kuçê da kolanên teng û tarî. Hecî di wan kolanên teng û tarî de car dîreksiyonê siwaryê bi alîyê rastê ve car bi alîyê çepê ve badida. Her ku siwara ji kolaneke tarî derbasî ya din dibû, bêhna Zeynê jî pê re teng dibû. Dema ku siwara cara dawî bi alîyê rastê ve zivirî, şewqa ronahiyên sê çar malan yên ku ji wê ve xuya bûyî, pî û bask li wê şikestandibûn. Her çiqas bi lêv nekirî be jî di dilê xwe de bawerîya xwe bi mirina birayê xwe nedianî. Her ku siwara nêzikî malê dibû, qelebalixa di hundur de baştir jê wê ve xuya dibû. Hîn jin di nava malê de bi vir û wê de dipêkîyan. Tiştin ji odeyekê dibirin odeya din. Du sê mêran jî bi alîkariya hevûdu sobeyek dibirin hundurê malê û çend jinan jî lûleyên sobê di destan de, xwe dabûn dû wan. Siwara rawestî, Hecî jê pêya bû. Herdu

zarokên Zeynê mat bûbûn. Çi diqewimî? Ew qelebalixa li ber malê çi bû – tenedigihîştin. Hema wisa li dora xwe dinêrîn. Hecî derîyê siwarê vekir, gazî zarokan kir û herdu zarokên Zeynê û Ehmed bi carekê re ji siwaryê pêya bûn. Zeynê pêya nebû, li şûna rûniştî, di ber xwe de digirî û dilorand. Bi gurnîya siwaryê re çend mêr û çend jî jin ji hundur derketibûn û berve wan hatibûn. Du jinan bi milên Zeynê girtin û ew ji siwaryê pêya kirin. Li wê şûnê dest bi şînê kirin. Cîranên ku hîn di xewa sibê de bûn jî, bi dengê şîna wan şîyar bûbûn. Bi nivro re sela birayê Zeynê, ji haporlerên mizgeftê, li nava gund belav bûbû. Gundîyên ku dengê sela bihistî qor bi qor kişîyan mala birayê Zeynê.

Dinê mijî bû. Zeynê hîn jî li pêş derî mîna peykerekê sekinîbû. Li wê roja ku xebera mirina birayê wê jê re hatî û li jiyana xwe ya ku piştî mirina birayê wê serûbin bûyî difikirî. Ji nişke ve ew herdu qeretiyan ku berî demekê li ber pencerê ji ber çavan wînda bûbûn, dîsa ji wê ve xuya bûn. Du qeretiyan ku dişibîn du çûkan xwe dabûn ber

devê hevûdu, kêf û kenê wan bû.

Li vê kêliyê Tawarekê jî li pişt pencerê Zeynê dişopand. Zeynê hîn jî li ber deriyê mala xwe, awirên xwe berdabûn pencereya qonaxê bêyî ku Tawarekê ferq bike, hema wisa bêliv, sekinîbû. Tawarek bi lez û bez pekîya û çû serşoyê. Tasek av bi ser porê xwe yê reş de kir. Hema rahişt pêşgirekê di porê xwe werda û bi lez derkete ser çardaxê. Li ser pêledanka herî jor rûnişt. Porê xwe yê reş bi ser milê xwe yê çepê de anî. Awirên xwe xistin rûyê Zeynê û porê xwe hêdî hêdî şeh kir. Eyam sar bû. Dilopên avê ji nava porê wê ve bi ser pêşîra wê de diçilikîn. Dilopên cemidî mîna ku devê kêrê li pêşîra wê ketibin pêşîra wê dişewitand. Lê Tawarekê Zeynê dabû ber sîngê xwe. Wê êşê jî kela dilê wê nedişkand. Porê xwe bi ser milê xwe ve anî û hûnand. Hecî li ser mînderên li ber pencereyê, di şûna ku xwe lêdirêjkirî de gazî Tawarekê kir: „Tawarek! Çayekê ji me re çêke.“ Tawarek bi dengê Hecî re rabû, bi kêf û coş çû hundir.

Zeynê jî dengê Hecî bihîstibû. Dema ku bi dengê Hecî re ew dûmenê ku li pişt pencerê ji wê ve

xuya bûyî hat bîra wê, dilê wê ji Hecî li hev ketîbû. Bavê zarokên wê, hevjinê wê yê panzdeh salan çawa bi hatina jinekê wisa guherîbû, fahm nedikir. Zeynê difikirî: „Qet bûka teze bi du zarokan, li gundekî wisa biçûk û di nava însanên wisa bi devûlêv de, bê mêr dibû? Wellehî wê di du rojan de navûdengê wê derxistana. Ma ne heyfa birazîyên min ê ku serê wan di nav xelkê de berjêr bibûna? Xwezî, xwezî birayekî min din hebûya, hînge wî yê Tawareka ji xwe re bibira. Qenê min ê ew dêlareş ji xwe re nekira hewî. Lê ka min li vê dine ji çi xêr dîtiye ku bi wê bibînim? ”

Dengê Hecî yê careke din gazî Tawarekê kirî, ew ji nava fikaran derxistibû. Ji sermayê dest û pî li wê cemidîbûn. Ji kîngê ve li ber derî dawestîbû nedizanî. Dema vedigeriya hundirê malê, kesereke kûr kişand. Herdu zarokên wê û yê birayê wê, ku di doşegê de wekî xwîşk û birayan di hembêza hev de razabûn, ji xewê ra bûbûn. Di nav nivînan de dikenîyan û dilîztin. Zeynê li wan nêrî, dilê xwe xweşkir û bêhna wê bi kenê zarokan fireh bû û berê xwe da mitbaxe.

Çend kilamên dila ji gundê Miklaîla/Înler Polatlı

Dr Mikaili

Çîroka kilamê

Ji gundî Bazika/Demirözü Hemikê Kino li gundî Mikaîlla serşivanê malê Heysifî Osman e. Zelxa Kewê jî li ba wana serî pêz digrê, berîvan e.

Hemikê Kino dilî xwe dike Zelxê, lê Zelxê nadine wî. Sal li derûdora 1940î ye. Ew jî li ser wê vê kilamê lihevtîne.

Me ew kilam ji devî Sita Omerî Heysif hilgirt.

*Ii me wêda Bazika ye
Başlix daket ber guhka ye
Î ku fodila te nasnakir
Ew serqamçiciyê gundî Îna ye*

*De çav reşê, de çav şaşê
De qaş û bru kiriye aşê*

*Ela/Allah ela bexê ela
Devî topê tasê qelan
Mi kir topikê xu birevînim
Eskerî gawir li min bûye bela*

*De çav reşê, de çav şaşê
De qaş û bru kiriye aşê
Here here lê Zelxikê
Ava gola kir neynikê*

*Ji me wê da Bazika ye
Başlix daket ber guhka ye
Heri lê lê te çav reşê
Heri lê lê te çav şaşê
Kijan meriyî te yî camêrî
Ji mi ra derxî gulaşê*

Kilama Xeyçe /Xetice

Çiroka kilamê

Li gundî Mikailan Mehî Osikê dilê xu dike Xeyca Hecîbegê, Xeyçe keçikeka wek deylaxa, rinda bejn çeleng bû ye. Mehî Osikê jî camer û rinde mêra bû ye. Lê meta Xeycê nahêle ku Xeyçe bidin wî. Ew jî li ser wê kilama lihevdaytîne. Bi rîya kilama ra giştika dide ku ew çiqas ji wê hez dike. Dura Xeyçe didin gundeki dur.

Berê li nav kurmancan kilam li ser gotin weke edet bûye, mîna Serenada ewrupîyan. (Gelo serenad jî ji zimani kurdî neyê?, Sere-nad yanê ya ku bi seri nahatiye.)

*Berxam çuye kinç şuştinê
Çavê m rawûn rûniştinê
Terka çavî belek nakim
Terka bejnê çeleng nakim
Heta rîyê ku têm kuştinê*

*Xetîce ye Xetîce ye
Mîna gulika beybunê ye
Mi dil heyî warim hindê te ye
Tirsa min li meta te ye*

*Dilo dilo gû di tewe
Kêrê bavê m xûn tunne we
Ew çi dilî min û te ye
Meta te ya gawir bû seweweç*

*Î ku navberê dilî min û te xeber dide
Gundî kor e, cî wî xu xûne*

*Xetîce ye Xetîce ye
Mîna gulika beybunê ye
Mi dil heyî warim hindê te ye
Tirsa min li meta te ye.*

Kilama Ela Hecyîwiş

Çiroka kilamê

Ela Hecyîwiş bi Ezeti Osikê va dergîstî bû ye. Li gund dukanek tê dervêkirin, wê jî davêjin ser Ezetî Osikê. Li ser wê xenzurî ku ew me-riye hev in û ji berekê ne, diwê ez keçika xu nadim û dergîstî wî, Ezetî Osikê dide ber Cendirma. Wext wexta yayla bû ye. Cendirme tên ji yaylê, kelepcê davêjin desti wî û dixwazin wî peya biwin qereqol.

Heta wêngê hersê birange wî Yîwiş, Meh, Hecik û pismamê wan vê dibihîzin û li hespên xu sîyar diwin, didin dû cendirma. Li nivîrê silahê xwe dikşînin xu didin ber cendirma û birayî xu Ezet ji destî cendirma hildigrin. Lê wê wextê hukma Hecyîwiş li dorberê hewû ye, Ew dîsa jî dibê ez keça xu nadim. Dûra mezinê malê û eşîrê dikevin navberê û ew dizewicin.

Ela Gewr û Tilbis li ser dergîstî xu ew kilama li jêr distire.

Hatî malê bi şev e

Xu li enîya gewr dikeve

Xelk elemê giştika gotin

Pismam dotmam yaqa hev in

Tu li qarşi başçewuş û bavî min sekini

Te go ez nabirim li Elê gewrê

Wî li minê, ax li minê

Dikin dîsa min nedinê

Dikin mi bavên uce dunê

Mehne li ser malî dunê

Lo go ustî bexê te zêrê zer e

Ji sîrkê Kemêl hatî der e.

Heta ku bexê te di te warkin.

Go derewi ortê îna meke.

*De Yayla bavî min bilind e
Li ser sekinî keçika rind e.
Lawiko erd elani li xu me de
Deste ter, çiçeka gund e.*

*Wî li minê , ax li minê
Dikin dîsa min nedinê
Dikin mi bavên uce dunê.
Mehne li ser malî dunê.*

*De Ela gewrê li pî bêriyê
Zêre spî li hillêwî ye.
Esker rabirtin bi şemsiyê
Lawkî min î eskerê Qolordu ye.
Xu dayî pêşîya ecemîya.*

*Wî li minê, ax li minê
Dikin dîsa min nedinê
Dikin mi bavên uce dunê.
Mehne li ser malî dunê.*

*Lawik diwarî me û we va yek e,
Arê dîwêr pencerê weke!
Zîyane Fodilê min pîrî çê ye,
Te go jêr da tê ye mihîna şê ye.
Go em serî pênc mêra didin kuştinê,
Em irza xu nadin xelkê.*

*Yayla bavî min li sirt e
Col û yazi mere gî girt e*

.....

Vegera nasnameyê

—Medyaya civakî û dîasporaya kurdî

Haci Akman

Profesor,

Etnolojî, Zanîngeha Bergen, Norwêc

Daxuyaniya pirsgirêkê

Kurdên li dîasporayê civakên serhêl ên wek facebookê çawa bikar tînin?

Beşdarên ku lêkolîn li ser wan e, temenê wan di navbera 23 û 40 salî de bûn û di dema anketê de li Norwêcê dijîn.

Armanca vê gotarê lêkolînkirina rola medyaya civakî di parastina nasnameya çandî û neteweyî ya kurdên li dîasporayê de ye. Bi vê yekê re weke xala destpêkê, em bi taybetî li wê yekê dinêrin ku gelê kurd ê ku li dîasporayê (niqteya destpêkê li Norwêcê) dijî, ji bo parastin û ronîkirina paşxaneyaya xwe ya kurdî çawa tora civakî ya facebookê bikar tîne. Li ser bingeha hevpeyivînên kalîteyî, lêkolîna me faktorên cihêreng nîşan didin ku beşdarên di hêlin facebook wekî kilîteke ji bo îfadekirin û parastina nasnameya xwe ya çandî û neteweyî bikar bînin. Analîz nîşan dide ku face-

book platformek e ku guheriyê û derfeta gelê kurd zêde kiriye ku bi malbat û hevalên ku li Kurdistanê û li dîasporayê dijîn re têkilî deynin. Em dibînin ku medyaya civakî ji wan re dibe alîkar ku têkiliyek xeyalî bi welatê xwe re biparêzin û hişmendiyek kolektîf a kurdî ya cihanî ava bikin. Facebook ji bo xurtkirina hesta aîdiyetê dibe alîkar û di heman demê de dibe cîhek virtual ji bo aîdiyeta xwe.

Peyvên sereke: dîaspora, ragihandin, parastin, nasnameya etnîkî/çandî, bêdewlet, medyaya civakî (facebook)

Pêşkêş

Civakên serhêl di van salên dawî de li çaraliyê cîhanê bûne amûrek zêde ji bo ragihandin û îfadeya kesane. Armanca vê gotarê ew e ku nîşan bide ka medyaya civakî çawa dikare ji bo kesên bêdewlet, yên li dîasporayê dijîn, bi hev re têkilî deynin û nasnameyên xwe yên çandî û neteweyî nîşan bidin. Bala me bi taybetî li ser gelê kurd ê li diyaspora li Norwêcê dijîn û bikaranîna malpera civakî ya facebookê ye. Niha nêzîkî 12000 kurd ji hemû beşên Kurdistanê li Norwêcê dijîn. Bi nehiştina xwedîderketina li tu sazî û dezgehên netewî û çandî li Kurdistanê, gelê kurd heta roja îro di warê îfadekirin û vegotina nasnameya xwe de bi awayekî fermî û “madî” pir kêm e. Lê bi zêdebûna înternetê re derfetên nû derketin. Di nivê salên 1990an de, civakên kurd ên li dîasporayê dest bi bikaranîna înternetê kirin, bi giranî bi nivîsandina e-naman û nîqaşên komên nûçeyan re sînordar bûn (Sheyholislami 2011:89).

Di lêkolîna xwe de, em lédikolin ka malpereke torê ya wek facebookê çawa dikare firsandên

nû bide kurdên li diyasporayê ku bi çanda ku ji wan derketiye re têkilî deynin û bidomînin, her weha ew çawa bi vê yekê nasnameya xwe ya çandî diparêzin.

Sirgûnkirinî

Gelek kurdên ku îro li dîasporayê dijîn jî bi navê sirgûnê jiyana xwe dijîn. Sirgûnî diyardeyeke siyasî ye ku hundir û kûrahiya mirov dixemilîne. Li sirgûnê bûyîn bandorê li hemû aliyên girîng ên jiyana penaberiyê dike. Dikare bingehê ezmûna rastiya civakî ya kesên ku bandor bûne xera bike, êrîşî hesta wan a ewlehiyê ya herî bingehîn bike. Ew dikare bibe şewqek ku peyva sirgûnê tarî dike, û efsaneya jiyana di navbera du çandan de wekî hêzek ajotinê ya çalakiya afirîneriya rewşenbîrî xurt dike, di vê çarçoveyê de nivîskar û filozof Albert Camus dikare wekî mînakek naskirî were binav kirin. Bê guman, nêrînek weha pîvanên bingehîn ên statûyê, wekî xemgînî, malwêranî û nebûna aîdiyetê ji holê radike. Îro têgîna sirgûnê kêmtê bikaranîn û gelek caran wek pîvaneke têgehên wek koçberî û dîaspora tê dîtin.

Helbestvanê ji Pragê, Rainer Maria Rilke (1875-1926) serpêhatiyên ku wî li bajarekî nû yê xerîb bûyî vedibêje. Di pencereya xwe de li bajêr dinêrî, hesta terikandin û xerîbiyê pê ketibû. Bajar ne mumkun dixuya ku bikeve, tenê wî girtin. Welat, malbat, heval û komên xwe yên li dîasporayê di qonaxek sînordar de têne dîtîn, ku tu kes ne xwediyê statuya xwe ya civakî ya berê an jî ya nû ye. Lê belê, ji bo gelek, salên sirgûnê bûne sedema guhertina vê rastiyê. Tiştêk bi tevahî rast nîne, ne tiştê ku wan li dû xwe hiştiye û ne jî ya ku hatine. Qonaxeke bendewariyê ye. Tê çaverêkirin ku di civakeke ku mirov tê de ye dest bi avakirina jîyanê bike.

Dema ku hûn ji civata ku we berê tê de bûn terikandin, bidestxistina fersendê raweste, û heya ku hûn venegerin an qebûl nekin ku hûn ê tu carî nikaribin vegerin. Zanînek weha dikare giran be, û di rewşek herî xirab de dikare bibe sedema ezmûnek gav bi gav biyanîbûnê. Hinekan hewl dane ku hesta biyanîbûn û tenêtiyê kêrn bikin û bêtir bibin mîna "yên din".

Diyaspora û medyaya civakî

Sedema çewsandin, sirgûn an revînê di dîrokê de zêde neguheriyê, lê mirov, civak û çarçove her dem diguherin. Pîrî caran ev çewsandin e ku encama çalakiya kesê ye ku dibe ku xwe mecbûr hîs bike ku sirgûnê wekî rêyek hîlbijartî hîlbijêrin. Ji ber vê yekê hebûna dîasporayê dikare wekî "cezakirinê" tevbigere, ku hem li ser kesan hem jî koman bandor dike. Ev yek îfadeya windakirina mafên bingehîn ên li welatê xwe, windakirina malbat û hevalên xwe, kar, diyardeya çandî û zimanê xwe ye.

Li dîasporayê, mirov dikevin nav çarçoveyek zimanî ya nû ku zimanê wan wekî amûrek ragihandinê an jî ji bo rûbirûbûna derdorên nû bêkêr e. Mirovên li diyasporayê dûrbûnek gav bi gav nayên ceribandîn, hinekî jî ji ber ku xalên wan ên referansê di rûyê civaka nû de bê belge ne an jî veşartî ne. Biyanîbûnek wiha ne tiştêkî ku meriv hildibijêre, ji hêla kesên din ve tê ferz kirin, û pîrî caran dibe sedema kêmnirxandinek cidî ji ber ku serpêhatî, fikir û hêviyên penaberiyê mîna berê ne

xwedî wateyekê ne, an jî zehmet e ku wan veguherîne çarçoveyek nû. Ji ber heman sedemê, jiyana li dâsporayê pir bi nakokî xuya dike. Ji bo gelek, ew lêgerîna aîdiyetê ye, ji bilî kar û çîyek jiyînê. Em dikarin zanibin ku cih bi xwe di hebûna nasnameya çandî de pîvaneke girîng e. Cih sembola sistemeke civakî ya ku tê ragihandin, ji nû ve tê hilberandin û jiyîn e. Bi vî awayî, em dikarin cîhê wekî tiştê ku çarçoveyek zimanê me, dîroka me, xwarin an kevneşopiyên muzîka me destnîşan dike fam bikin. Lê aliyê nû yê cîyan ew e ku êdî nikare weke yekane çarçoveya têgihîştina me ya çawaniya pêkhatina nasnameya çandî were dîtîn. Li şûna ku nasname tenê bi yek cîhî ve were girêdan, îro em dikarin formên aîdiyetê yê hevbrîd jî bibînin.

Bi vê yekê re, em ê di wê çarçoveyê de îdîa bikin ku medyaya civakî yê wekî facebook, x, blogger û malperên din ên civakî dikarin cîhên nû ji bo aîdiyetê pêşkêş bikin. Teknolojiyên dijîtal ên wekî komputer, tîlefônên desta, înternet û medyaya civakî di warên rojane yê jiyana me

de dest bi serhildanekê kirine. Sosyalbûna bi heval û malbatê re, peydakirina hevalên nû, peydakirin û bidestxistina agahiyan, xwe perwerdekirin, kirîn, ev hemû danûstandin bi alîkariya malperên civakî yê di qada virtual de dikare were kirin. (*Karahasanovic et al. 2008*).

Ji bo gelek kesan, tenê yek ji pirsgirêkên herî mezin e.

Teknolojiya bi vî rengî dikare ji bo gelek kesên ku li sirgûnê û di rewşeke dâsporayê de dijîn derfetan peyda bike. Înternet di jiyana gelek kesan de rolek mezin dilîze û ji bo hin kesan ev beş dibe ku yekane çareserî be ji bo parastina nasnameya xwe ya çandî, nemaze di civakek ku êdî meriv ne beşek ji piraniya çandî ye, an ku êdî meriv nema ye, xwe di qada çandî ya ku tê de dijîn nas dikin. Teknolojî guhertiye û îmkanên liv û tevgerê yê mirovan zêde dike. Ev ne diyardeyek nû ye, lê cîhana dijîtal guheriye û îmkan hê bêtir zêde kiriye, nemaze dema ku ew danûstandin û bandora çandî tê. Şêweyên nûtir û bileztir ên pêwendîya navkesî hene, ku di heman demê de fersendê dide ku agahdarî bi awa-



Ev wêne bi Artificiell intelligens (AI) hatiye çêkirin.

yek xweştir ji berê belav bibe. Bi awayek radîkal, pêşkeftina bilez û belavbûna teknolojiya dijîtal di jiyana meya rojane de îmkanan diguhezîne. Gelek hemwelatî di civakek dijîtal a pêşkeftî de dibin beşdarên çalak û afirînerên naverokê (Brandtzæg and Lüders 2008). Facebook di sala 2004an de hate damezrandin, facebook yek navgînek wusa civakî ye ku dihêle mirov bi heval, malbat û hevkarên xwe re zû û bi hêsanî

bi teknolojiya dijîtal mîna komputer û tîlefônên desta re têkilî daynin.

Facebook dikare çî pêşkêşî bike? Kesên li dîasporayê dijîn dikarin bi alîkariya facebookê bibin beşdarê pêvajoyek ku aîdiyeta cîhek dikare bi komek civakî ya li ser malperê çêbibe, dema ku li cîhek din dijîn.

Gelek kurdên ku belkî qet neçûne Kurdistanê, dibe ku hîna jî tîgeheke derûnî ya vî welatê

hebe. Nasnameya diyaspora ya bêdewletî bi gelemperî behsa beşên ji hev cuda yê neteweyekê dike ku nekariye dewleta xwe ya fîzîkî ya serbixwe ava bike (Sheffer 2003). Belavbûna gelê kurd û nebûna herêmeke erdnîgarîya ku bi awayekî qanûnî hatiye avakirin û di asta navneteweyî de hatiye naskirin, tê wê wateyê ku diyaloga li ser mîrateya çandî, bîra çandî û nasnameya çandî bê berdewamî ye.

Belavbûna gelê kurd û nebûna herêmeke erdnîgarî ya ku bi awayekî qanûnî hatiye avakirin û di asta navneteweyî de hatiye naskirin, tê wê wateyê ku diyaloga li ser mîrateya çandî, bîra çandî û nasnameya çandî bê berdewamî ye. Di rewşên wiha de birêxistinkirina bîr û nasnameyêke çandî hîn aloztir dibe. Ji ber ku zehmet e kurd li welatê xwe û hem jî li dîasporayê pisporên pêşeyî kom bikin û organîze bikin. Pirsar me ev e ku gelo medyaya civakî dikare li cîhanek bê zemînek sabit piştgirî bide û gelo dema ku em li medyaya civakî mêze bikin, em ê komên ku li dîasporayê dijîn û medyaya civakî wekî amûrek ji bo dîtina

têgihîştina nû, wateyên nû û armancên nû bikartînin bibînin?

Facebook bi şiyana parvekirina wêne, nivîs û ramanan li ser înternetê, hem jî bi gihandina wan ji her kesî re, dikare potansiyelek peyda bike ji bo civakên dîaspora yê bêdewlet, ku ji ber sedemên cûda ne derfet û ne jî destûr hene ku sazî û dezgehên fîzîkî ava bikin. Facebook, ku wekî navgînek gerdûnî tê dîtîn, dikare bibe alîkar ku erdnîgariyek çandî ya nû ava bike ku dikare ezmûnek nû pêşkêşî mirovên li diyasporayê bike.

Facebook -Têkilî

Di vê beşê de, em ji nêz ve li hin helwest û pratîkên beşdaran ên di derbarê karanîna facebookê de digerin. Li gorî lêkolînerê mediyayê Henry Mainsah (2009), facebook ji bo endamên civakên herêmî yê ku li parzemînên cihê dijîn rêyek pêwendiyek hêsan dide. Ji ber vê yekê komên diyasporayê yê ku gihîştina înternetê bi karanîna nûjen bikar tînin da ku girêdanên navneteweyî saz bikin (Mainsah 2009). Ev yek ji aliyê hemû îxbarên me ve jî tê piştrastkirin. Sedema wan a sere-

ke ya destpêkirina hesabek li ser facebookê ew bû ku bi malbat û hevalên ku li welatên din li sirgûnê dijîn re têkilî deynin. Beşdarê me Heval wiha dibêje:

“Ez niha 13 sal in ku li welatê xwe nebûme û min zanibû ku birayên min û malbata min, hem li sirgûnê û hem jî li welatê min, facebookê bikar tinin û em dikarin bi rêya facebookê bi hev re têkiliyê deynin. (...) Ji ber vê yekê ev bi awayekî pir baş bû. Min dîsa wan nas kir, ji ber ku piştî 13 salan min nizanibû kî kî ye. (...) û di heman demê de pir balkêş bû, ji ber ku min bi hevalên ku du, sê-deh sal in min nedîtine re jî têkilî danî û em dîsa bûn heval. Ji ber vê yekê ez bi rêya Facebookê re têkilî dikim. Ez salekê li Almanyayê mam û li wir min çend hevalên xwe çêkirin, ku hinek jî wan jî kurd in. Têkiliya min tune bû, lê bi riya Facebookê min bi kêmanî bi hin jî wan re têkilî danî”.

Însan facebookê wekî celebek jûreyek civînên virtual ku ew dikarin bi kesên ku ew nas dikin û ku demek dirêj ew nedîtine re têkilî deynin. Ji bo Renas, ev faktora herî balkêş a xwedî hesabek facebook bû:

“Bi dîtina min tiştê herî balkêş di facebookê de ew e ku min bi hevalên xwe yên pir kevn re, ji zarokatiya xwe de, an jî dema ku em bi hev re diçûn dibistanê li

Kurdistanê, têkilî danibûn. Bi dîtina min û dîtina wêneyên wan û nivîsandina wan (...) ez difikirim ku ev pir balkêş e. Ez difikirim ku ev ya herî balkêş e. Beşek ji wan niha li welatên din ên wek Swêd, Kanada û DYA'yê dijîn, hinek jî li Kurdistanê dijîn”.

Li gorî antropolog Daniel Miller (2011), gotina Rênas li ser hevdîtina bi kesên ku bi wan re çûye dibistanê û yên ku bi xwe koçî welatekî din kirine, dikare wekî awayê klasîk ê hevaltîyê li ser facebookê were binav kirin. Ji bo wî, wisa dixuye ku facebook têgihîştina peyva civatê vejandîye û berfireh kiriye (Miller 2011). Ev yek dikare bi teswîra Hevalê ku ji hevaltîya bi kesên ku bi xwe re nedîtîye re eşkere bike: ”Malbat, heval û hin kesên din, bi tevahî rasthatî hene ku ez wan nas nakim. Wek mînak kesek ji Misrê, ez wî nas nakim. Wî tenê dixwest hinekî li ser Norwêcê bizanibe. Kurdekî ku li Misrê dijî.” Heval jî di wê baweriyê de ye ku facebook: ”(...) kanala ku mirov tê de hevûdu nas dikin, li şûna ku hûn li pey hev gazî hemû malbatê bikin, hûn dikarin sê-çar hevokan binivîsin, bişînin da ku her kes wê bixwîne. .”Ku Facebook cîhê civînê ye, jî hêla hemî

beşdarên me ve tê destnîşan kirin dema ku ew dibêjin ku ew kêmezêde bi awayekî aktîf beşdarî nav "koman" bûne. Van koman bi gelemperî li gorî berjewendiyên hevpar tene damezrandin û ji bo endaman platformên nîqaşê ava dikin. Hemî bikarhêner dikarin tevî bibin an komek çêbikin. Ev dikarin bibin qadan û xizmeta armanca avakirina hevgirtinê di navbera mirovên ku xerîb in, lê yê ku bi hev re girêdayî ne, wek nimûne, bi têkiliyên hevpar ên wekî netewe û etnîkî (Main-sah 2009). Beşdar Sema diyar dike: "Ez carekê endamê komeke Mezopotamyayê bûm. min eciband. Ew xort bûn, kurdên ku hevdu nas nedikirin û li Norwêcê diman. Ji ber vê yekê me hevdu nas kir û bi rastî jî baş bû. Ciwanên ji Mezopotamyayê, pir xweş bû".

Komên bi vî rengî dikarin qadekê ji bo aîdiyeta hestiyarî ya li cîhekî jî peyda bikin, ku li gorî Massey (1994), ji girêdana fîzîkî an arîdî girîngtir e û pê re civakek li heman cîhî tune be jî dikare bijî. Heval ji me re mînakek ji komeke ku piştgirî dide girêdanek hestiyarî bi bajarê xwe li Kurdistanê re dide me:

Mînak gundê ku ez jê tîm me koma xwe ya facebookê ava kir. Em 180 kes in, yanî her carê ku ez e-nameyek ji komê re dişînim, dê 180 kes wê wergirin. Di heman demê de, hûn ê ji komê gelek agahdarî bistînin, mînakî ku ew li gund gelek tiştan ava dikin, wek mizgeftek nû an dibistanek nû û mamosteyek nû ji cîhek din tî û heye û bi vî awayî. Hemû agahî li ser gund in, pir balkêş in. (...) û em belav bûne, mirov li Amerîka, Îngilîstan, Almanya, Hollanda, Fransa, Norwêc, Swêd, Danîmarka û Tirkiyê, yanî li her derê dijîn û ji ber ku em ji gundekî li ser sînorê Kurdistanê ne. li Tirkiyê û berê jî li wir şer hebû. Ji ber vê yekê mirov ji hev belav bûne. Ji ber vê yekê dema ku kesek vedigere gund, wêneyan dikişîne û li ser facebookê li ser gund raporek dinivîse, da ku hemî yê din, wekî yê Dewletên Yekbûyî yê Amerîkayê, pir kêfxweş bibin. – Ango grûp bi awayekî pêwendiya xwe bi cîhê re diparêze? – Belê, tenê girêdan."

Stratejiyên ji bo bikaranîna facebookê

Dema ku me li gorî paşxaneyê wan a kurdewarî nihêrîn, me dît ku beşdarên me facebookê bi

awayên cuda bikar tînin. Main-sah (2009) destnîşan dike ku di nav civakên diasporayê de du stratejiyên sereke yên bikaranîna medyaya civakî ji hev cuda dikin. Li aliyekê "rêbazên aîdiyetê" yên ku behsa kiryarên şênber û nîşanî yên ku mensûbbûna komekê nîşan dide û li aliyê din jî "rêbazên hebûnê" yên ku li qadên civakî yên wekî sazî, rêxistin û ezmûnan vedihewîne, vedihewîne. Em dikarin bibêjin ku beşdarên her du stratejiyan jî ji bo ragihandina nasnameya xwe ya kurdewarî û aîdiyeta xwe bi rêya facebookê bikar anîn. Weke mînak, agahdar Rênas bi danasîna wêneyên cuda yên Kurdistanê li ser profîla xwe ya facebookê bi awayekî aktîf aîdiyet û nasnameya xwe ya kurdewarî nîşan da:

"– Hûn li ser facebookê tekez dikin ku hûn ji Kurdistanê ne?"

–Belê, ez dikim, bêguman. Mesela ez wêneyên cil û bergên kurdî li ser facebookê diweşînim û li ser pîrozbahiyê dinivîsim, wek mînak şahiyêke efsanewî bû yan jî tiştêkî wisa. (...) û carekê ala kurdî ya bi şiklê ajel wek wêneyê profîla min hebû û gelek şîrove li ser min hatin kirin, wek "Ax çi alayeka

xweş e!" an jî "Ma ev ala kurdan e?". Gava ku min ew dit, ez ji, mînakî, şîroveyên li ser kincan bêtir kêfxweş bûm. Ez ji şîroveyên din bêtir kêfxweş bûm ku şîroveyên li ser ala welatê xwe werdigirim."

Wekî din, beşdar Kanî jî bi coş û kelecana firsendê diweşîne û wêneyan diweşîne û pêwendiya xwe ya bi kurdî diyar dike. Di vê çarçoveyê de, bi taybetî wêneyên, wek nimûne, dîmen, cil û berg, sembolên malbatî û neteweyî yên kurdî hene:

"– Li ser profîla te jî wêneyên te hene?"

– Belê, bi hezaran wêneyên min hene! Ez havîna par li Kurdistanê bûm û min gelek wêneyên xwe, xizm û xwezaya xweş kişandin. (...) her kes bêriya Kurdistanê kiriye û loma jî hema hema her roj wêneyên nû li ser facebookê diweşînim. Nêzîkî 1500 wêneyên min hene tenê ji Kurdistanê ji havîna par û ji dema ku ez di dawetekê de bûm, bi cil û bergên kurdî.

– Ji bo te girîng e ku mirov te bi cil û bergên kurdî bibîne?"

– Belê ez ji cil û bergên kurdî hez dikim û ji ala kurdî jî hez dikim!

– *Di profîla te ya facebookê de jî ala te heye?*

– *Belê helbat!*”

Weke ku di danasîna Rênas û Kanî de jî tê dîtîn, bi taybetî bikaranîna sembolên wek al û cil û berg, ji bo beşdaran rêyeke girîng e ji bo diyarkirina nasnameya xwe ya etnîkî, neteweyî û nasnameya xwe. Sema herwiha amaje bi wê yekê jî dike ku ew wêneya ala Kurdistanê ji bo bal kişandina ser aîdiyeta xwe bi kar tîne. Di heman demê de, ew bi agahdarkirina endamên din ên facebookê li ser bûyerên girîng ên çandî yên kurdî jî mijûl e:

– *Ma hûn difikirin ku facebook dikare ji we re bibe alîkar ku hûn nasnameya xwe ya kurdî diyar bikin?*

– *Belê, ez dikarim alekê nîşan bidim, bo nimûne ala kurdî.*

– *Di profîla te de heye?*

– *Belê, li ser profîla min heye, herwiha agahî li ser Newrozê ku cejna kurdan e jî hene. Ji bo gelê kurd wateyek wê ya girîng heye û ji ber vê yekê ez li ser facebookê hin agahiyan li ser Newrozê diweşînim, wek ku tê çî wateyê û çima ji bo me girîng e.”*

Sema ji me re behsa cejna

sersala kurdî, Newrozê dike, ku di 21ê Adarê de ji aliyê zêdetirî deh hezar kurdên li diasporayê ve bi beşdariya şahiyeke mezin tê pîrozkirin. Tevî ku gelek ji wan ji herêm, civak û tebeqeyên civakî yên cihê bin jî, ji bo piraniya wan ev bûyer bûye firsendek ji bo dîyarkirina nasnameya xwe ya hevpar a kurdan. Diyaspora gelek caran bi alîkariya van helkeftan bû cihê ku kurdên herêmeke Kurdistanê bi kurdên parçeyên din ên welêt re cara yekem li hev dicivin (Sheyholislami, 2011). Parçeyek ji hevpeyivîna bi Rênas re dikare mînakêk ji ”rêbazên hebûnê” yên jorîn re bide me, wekî rêgezêk yekgirtîtir a civakî ya karanîna facebookê di çarçoveyek diyasporayê de. Ew behsa endametiya xwe di grûpên cuda yên facebookê de dike ku bi vî awayî armanca wan piştgirîkirina nasnameya neteweyî ya kurdî ye: (...) *gelek kurd endamên komên bi navê ”Belê ji dewleta kurdî re”, ”Selvstendig Kurdistan” an jî tiştêkî wisa ne.*

– *Çima hûn endamê komên wiha ne?*

– *Ez wisa difikirim ku divê ez piştgiriya wan bikim, heta ku*

ew ne girêdayî partiyek an komek tundrew bin. Dema tiştêkî ku ji bo hemû kurdan û bi giştî ji bo tevahiya Kurdistanê baş be hebe, ez bi rastî jî dixwazim piştgirî bidim.

– Ma hûn difikirin ku ew bi riya Facebookê baş dixebite?

– Erê, ew baş dixebite, bi rengêkî ku hûn vê hesta "baş e, em li vir gelek in".

Em dikarin bibêjin ku facebook bi vî awayî forûmekê dide kurdan ku tê de wêneyê dîasporaya xwe ya hevpar bi dest bixin. Li gorî etnolog Şî, têtîngên bi vî rengî her tim li ser aliyên wekhev ên nasnameyên takekesî yên di warê çand, erdnîgarî û dîroka hevpar de radiwestin (2005). Van xeyalan ferdên cihêreng bi ya ku Benedict Anderson (1983) jê re dibêje "civaka xeyalî" ya ku ji kesên ku dê tu carî piraniya mirovên xwe yên mirovî nas nekin, pêk tê ve girêdidin. Lê di mejiyê her yekî ji wan de wê dîmenek bihevrebûna wan hebe. Awayekî din ê ku beşdar bi rêya facebookê nasnameya xwe ya kurdî pêşkêş dikin û diparêzin ew e ku bi awayekî aktîf navbeynkarî û nûjenkirina zanyariyên cihêreng ên derbarê

Kurdistanê de dikin. Di vê çarçovê de, agehdar bi taybetî tekezî li ser wê yekê dikin ku bi hêsanî û bilez zanyariyên derbarê Kurdistanê de bigihînin endamên din. Weke mînak, Sema hez dike ku agahiyên taybet li ser Kurdistanê belav bike ku bi baweriya wê bi giştî nayên zanîn û ji ber vê yekê divê zêdetir bala wan bê kişandin. Di heman demê de ku ew vê yekê dike, hestek wê çêdibe ku karibe nasnameya xwe ya kurdewarî bi awayekî zelaltir îfade bike:” *Ez gelek caran linkan bi hevalan re parve dikim, bo nimûne li ser sînorên Kurdistanê, bi taybetî ji bo kesên ku nizanin sînorên Kurdistanê li ku ne. Hûn nikarin wan li ser nexşeya cîhanê bibînin û ji ber vê yekê ez wan li ser facebookê diweşînim da ku hûn wan bibînin û ez nîşanî we bidim ku Kurdistan li wir e. Lê eger Kurdistan li ser nexşeyê bûya, min ê ev yek nekira. Ez dikarim nîşan bidim ku ev beşek ji nasnameya min e. Dibe ku welat ji ber pirsgerêkên siyasî li ser nexşeyê tune be, lê di dil de heye. (...) Ez li ser facebookê jî agahiyên derbarê Helebçeyê de diweşînim. Di sala 1988an de li Helebçeyê gelek kurd hatin kuştin*

û dema ku roja bîranînê nêzîk bû min tişteke li ser wê nivîsand. Min ji malpereke kurdî hin agahî, hin rastî li ser vê rojê belav kirin da ku mirov vê rojê bibîne û bixwîne.” Lê Sema berdewam dike û dibêje ku ew bi rêya facebookê jî fêrî aliyên ku heta niha nehatine zanîn yên çanda kurdî dibe: *Min bi rêya facebookê çend hunermendên kurd nas kir. Hevalên min ji min re lînkên dişînin û hunermendan pêşniyar dikin. Ez difikirim ku ew pir baş e. Paşê bi rêya facebookê min hunermendên curbecur ên muzîka kurdî nas kirin, an jî ez hatim vexwendin konseran, ev yek jî bi dîtina min plusek e.*

Bi vî awayî em dikarin bibêjin ku facebook dikare di nav gelê kurd de jî bibe alîkar danûstendineke çandî. Lê malper di plansazkirin û organîzekirina bûyeran de jî dibe alîkar. Kanî amaje bi wê yekê jî dike ku facebook alîkariyeke hêsan û bilez e dema agahdarkirin û komkirina xelkê ji bo bûyerên kurdî li Norwêcê, wek xwepêşandan. Bi dîtina wê, bi rastî ev kalîteyê ye ku dihêle facebook wekî cîhek cidî xuya bike:” *Ez dibînim ku gelek kesên ku li ser facebookê pir*

çalak in hene, ji ber vê yekê ez difikirim ku ew cîhek cidî ye. Di demeke nêz de, wek nimûne, em ê li Osloyê xwenîşandaneke bikin. Ji ber vê yekê em tişteke diweşînin û li ser Facebookê mirovan agahdar dikin, bi taybetî jî ciwanan. Dema ku wan agahdarî wergirt, ne hewce ye ku em gazî wan bikin, ji ber ku wan berê fêm kiriye ku divê ew li ku be û li ser çi ye.” Wekî din, beşdarên me facebookê jî wekî amûrek girîng dibînin ku bikarin ramanên xwe li ser rewşa siyasî ya îroyîn a Kurdistanê nîşan bidin: Kanî vê yekê diyar dike“(…) *piraniya hevalên min, an jî yên ku pêwendîya min bi wan re pir baş in, em xwe her tim nû dikin û bi giranî tenê li ser Kurdistanê. (...) û paşê ez endamê rûpelên cihêreng ên li ser facebookê me ku em tenê nîqaş dikin.*

– *Ev rûpelên siyasî ne?*

– *Belê, tenê rûpelên siyasî yên kurdan hene.*

– *Ma hûn ê bibêjin ku bi vî rengî hûn bi riya facebookê devê xwe digirin?*

– *Erê, ji ber ku her gav ne mîmkun e ku meriv li ser tiştê ku hûn di rastiye de dixwazin bi dest bixin de nîqaş an nîqaş werin kirin.*

Hûn kêr caran fersendê digirin, lê li ser facebookê gelek caran nîqaş, gotar û nîqaş li ser mijarên ku ez jê hez dikim hene.

– Ma ew hinekî azad e?

– Belê, bi awayekî tu çi bixwazî dikî. Li ser facebookê, tişt dikarin bi reneke hêsantir biqewimin, di heman demê de di rastiyê de pir caran kombûna mirovan pir diwar e.”

Kanî destnîşan dike ku facebook wekî cîhek virtual dikare ji her cîhek rastîn fersendek çêtir ji bo vegotina siyasî û hestiyarî û nîqaşan pêşkêş bike. Daxuyanî nîşanî me dide ku înternet û bi taybetî medyaya civakî ya wekî facebookê, ne tenê cihên nîqaş û kombûnê pêşkêşî dike, di heman demê de dihêle ku kes dengê xwe derbixin. Ev alî jî ji hêla Mainsah (2009) ve tê ronî kirin, ku bawer dike ku medyaya serhêl wekî facebook platformek ji bo diyalogê pêşkêş dike, ku meriv ne tenê dikare xwe îfade bike, lê di heman demê de dikare li benda bersivê ji temaşevanên herêmî an jî gerdûnî be.

Facebook ji bilî ku bibe qada nîqaş û pevguhertina agahiyan, ji bo îfadekirina kêfxweşî û

xemgîniyê jî cîh peyda dike. Çend agahdar dibêjin ku nûçeyên li ser tiştên ku li Kurdistanê diqewimin gelek caran bîr û hestên xurt di wan de derdixê holê û facebook dikare ji bo van tiştan piştgirî bide wan. Gotina ji Kanî dikare wê mînak bide. Ew destnîşan dike ku facebook dikare bi hestên xwe re hestek ne tenêbûnê bide wê:

”Di van demên dawîn de gelek bîranîn hatin serê min, min ew qas tiştên ku li Kurdistanê diqewimin û bi taybetî jî li ser facebookê dixwend. Mesela erdhej, her kurdê ku li ser facebookê be tiştêkî li ser erdhejê dinivîse. Ji ber vê yekê ez dikarim bibînim ku ew bandorê li me hemûyan dike.

Formên nû yên çandî

Jiyana di çandek nû de, lê ne bi tevahî di wê de, dikare di heman demê de hem stres û hem jî dewlemendtir were ceribandin. Jiyanê li dîasporayê tê wateya ku hûn bi çend çandan re mijûl bibin. Bi van danûstandinan, ku mirov dikare bêje pêvajoyeke ku tê de çand tê kêşe û civak diguhere, gelek caran formên çandî yên nû derdikevin holê. Medyaya civakî

ya wekî facebook di vê çarçoveyê de wekî hawîrdora herî baş ji bo ku jê re tê gotin pir çandî (bricolage) xuya dike (Mainsah 2009). Li gorî Heval, facebook ji bo adaptasyonê û hem jî ji bo afirandina vegotinên nû yên çandî xuya dike. “Ez gazî kesî nakim ku rojbûna min pîroz be ji ber ku ew ne beşek ji çanda min e. Lê di facebookê de bûye çand, ji ber ku roja rojbûna mirov heye, di facebookê de tê nîşandan û paşê min jî dest bi pîrozkirinê kir. Bi awayek, ew bû rûtînek nû û ya ku ew kiriye, facebook e.” Lê ne tenê rêzgirtina ji bo rojbûna mirovekî, her weha bibîranîna mirina mirovî bi rêya facebookê rê û awayên nû yên ragihandinê û formên beşdarbûnê bi dest xist. Heval wiha dibêje:

”Dema kesek li Kurdistanê bimire derfeta min tune ku ez biçim cenazeyekê. Wê hingê facebook cîhek baş e ku mirov dikare bestên xwe yên têkildarî mirinek an bûyerek din diyar bike. Ji ber vê yekê ew qadeke pir girîng e û ez dibînim ku em li sirgûnê pir bikartînin.

– Ango hûn dikarin beşdar bibin?

– Erê. Sê hefte berê mamê min wefat kir û her kes li ser facebookê bû, li Kurdistanê jî di nav de. Hatî li ser facebookê û nivîsandin ku ew miriye û bi wesf û wêneyên ji merasîma cenaze hatiye, cureyekî raporê ye. (...) Berê we kulîlk jî nedianî ser cenazeyekê, lê niha kulîlk tînin û didin wir da ku wêneyekê bikîşînin û li ser facebookê biweşînin.”

Ciyek ku meriv xwe bi xwe hîs bike

Bi piranî, beşdarên me feydeyên ku facebook dikare bide wan di warê îfadekirina nasnameya xwe ya kurdî de piştrast dikin. Sema bi kurtasî nêrîna xwe ya derbarê facebookê de dide me. Ew difikire ku malper, berî her tiştî, navgînek girîng û piştgirî ye ji bo kurdan, miletekî bê dewlet, ku çand û nasnameya xwe nîşan bide:

”Ji bo kurdan helbet xwe nîşankirin çareseriyeye baş e. Ji ber ku em miletekî bindest in û ne tenê li Tirkiyê, li hemû cîhanê jî wisa ye. Heya ku mirov bixwaze ji te bipirse ”Tu ji ku derê yî?” û tu malek an cîhek ku hûn bikarin navê xwe lê bikin tune, lewra (...). Li çar

*aliyê cîhanê li cem kurdan jî wi-
sa ye, heta ku welatê me nebe em
herin ku derê. Ez kêfxweş im ku
facebook heye, ji ber ku ew cîyek e
ku hûn dikarin di derheqê rewşê
de rastgo bin û ji ber ku em vê cîyê
bixwe çêdikin.”*

Weke piraniya beşdarên me,
Sema jî lê zêde dike ku facebook,
her çend ew cîyek virtual û nerast
be jî, dikare qada ku tê de hest bi
aîdiyetê bike, bide wê. Rastkirina
wê ya ji bo vê yekê bi giranî di
wê yekê de ye ku li vir ew dika-
re bi awayek pir hêsan bi malbat
û hevalên ku li diyasporayê li
welatên din dijîn ve girêbide:

– *Hestek we heye ku facebook
dikare celebek aîdiyetê bide we?*

– *Belê, carinan. Diyar e ku êdî
ne di jiyana rast de ye, ez bi renekî
diçim cîhanek din ku ez dikarim
xwe nêzî malbat û hevalên xwe his
bikim, ji ber ku ez dikarim bi wan
re têkiliyê deynim, û bê guman ew
cîhanek din e, lê ew beşek ji cîhana
me ye.”*

Ev daxuyanî di dawiyê de
tekezî li ser wê yekê dike ku face-
book bûye amûrek bingeîn ji bo
ragihandinê di navbera kurdên li
diyaspora li Norwêcê dijîn.

Xelasî

Armanca giştî ya vê gotarê ew bû
ku rola medyaya civakî di paras-
tina nasnameya çandî û neteweyî
de di nav mirovên bêdewlet ên
diyasporayê de binirxîne. Ji vî alî
ve, me bi taybetî li wê yekê mêze
kir ku gelê kurd ê ku li diyaspora
li Norwêcê dijî, ji bo parastin û
balkişandina paşnava xwe ya
kurdî çawa tora civakî ya
facebookê bikar tîne. Li ser bin-
geha hevpeyvînên bi kalîte,
lêkolîna me faktorên cihêreng
nîşan dide ku beşdarên me
dihêlin facebookê wekî kilîtek ji
bo îfadekirin û parastina nasna-
meya xwe ya çandî û neteweyî bi-
kar binin. Analîz nîşan dide ku
facebook platformek e ku guheri-
ye û derfeta kurdan zêde kiriye
ku bi malbat û hevalên ku li
Kurdistanê û li diyasporayê dijîn
re têkiliyê deynin. Em dibînin ku
medyaya civakî ji wan re dibe
alîkar ku têkiliyek xeyalî bi welatê
xwe re biparêzin û hişmendiyek
kolektîf a kurdî ya cîhanî ava bi-
kin. Facebook ji bo xurtkirina
hesta aîdiyetê dibe alîkar û di he-
man demê de dibe cîyekî virtual
ji bo aîdiyeta xwe.

Litteratur

Anderson, Benedict. 1983. *Imagined Communities. Reflections on the Origin and Spread of Nationalism*. London/New York: Verso.

Brah, Avtar. 1996. *Cartographies of Diaspora: Contesting Identities*. New York: Routledge.

Branstzæg, Petter B. og Marika Lüders. 2008. *Eborger2.0: den allminnelige borger som leverandør av offentlig informasjon?* Trondheim: SINTEF IKT.

Cohen, Robin. 1997. *Global Diasporas. An Introduction*. Seattle: University of Washington Press.

Hassanpour, Amir. 2003. "Diaspora homeland and communication technologies." s. 76-88 i *The Media of Diaspora*, utgitt av Karim H. Karim. London/New York: Routledge.

Karahasanovic, Amela. 2008. "NordiCHI 2008 Workshops: new approaches to requirements elicitation & How can HCI improve social media development?" s. 25-32 i *Nordic Conference on Human-Computer Interaction Lund 2006*, utgitt av Amela Karahasanovic og Asbjørn Følstad. Trondheim: Tapir akademisk forlag.

Mainsah, Henry. 2009. "Ethnic Minorities and Digital Technologies. New Spaces for Constructing Identity." Ph.D. dissertasjon, Department of Media and Communication, University of Oslo, Oslo, Norway.

Sheffer, Gabriel. 2003. *Diaspora Politics: At Home Abroad*. Cambridge: Cambridge University Press.

Sheyholislami, Jaffer. 2011. *Kurdish Identity, Discourse, and New Media*. New York: Palgrave Macmillan.

Statistisk sentralbyrå. 2009. "Årsmelding 2008: internasjonalt samarbeid." *Planer og meldinger*. Oslo: Statistisk sentralbyrå.

HUNER

Amadekar: Muzaffer Özgür

Wênesaz Özüdoğru: Di hunera min da şopên bav û kalên min hene.



İnci Özüdoğru

Wênesaza ji Polatliyê İnci Özüdoğru, di zarokatiya xwe da mêla xwe dide wênesaziyê. Meraqa wê ji berê da tê lê ew nêzî heşt sala bervê bûye wênesaz (ressam). Li zanîngeha Anatolîyê xwendîye.

Özüdoğruyê li Polatliyê dersên wênesaziyê dîtîye û ev sê sal in li

malê karê xwe didomîne. Ji ber ku ew kurd e, dema dersên wênesaziyê de ji aliyên mamostê wê bi erîşên faşîst rexne lê hatine kirin. Di dema dawî de jî li ser medya civakî ji aliyên nîjatperestên tirk va tê rexne kirin.

Özüdoğru ku nêzî 40 tabloyên wê hene, di sala 2020an de bi tab-

loya "Şahmeran" beşdarî Galerîya Monalisa ya Parîsê bûye.

Gelek berhemên wê di galeriyên hûnerî de cih girtine û li Tirkîyeyê hatin pêşandan. Di sala 2022an de li Ankarayê bi çend tabloyên xwe beşdarî pêşengeha „Art Ankara“ bûye.

Ew li ser mijarên jinan û “zarokên bûk” disekine û bo vê yekê hişyariyê jî dide.

Özdoğru diyarkir ku ew tabloyên têkel çêdike. Di nav tabloyên wê da mijarên veqetî (bi Îngîlîzî abstract), naturmort, tazî (bi Îngîlîzî nude), figuratîf, portre û perspektîf hene.

Li gor wênesaza kurd tabloyên nude gelek girîng in: “Eşkereye ku sîstema bavîksalarî (bi Îngîlîzî patriarchal) li ser jinan zehmet e. Di hunerê da rexneya vê sîstemê barekî giran e, lê disa jî felsefeya min ev e.”

Ew tîne bîra me ku huner weke bîranînekê ye.

Li gor İnci Özüdoğruyê gundê ku dayika we lê bûye, Haymana ye û kurdayetiyê bandoreke mezin li ser wê û tabloyên wê kiriye: “Min jineke kurd a ji Dersimê û xaltiya dayikê xwe ya ji Haymanayê di tabloyekê de xêz kir. Disa, dema ku min



Zaroka bûk

bihîst med kurd in, min portreya Nefertitiya medî xêz kir. Ez bawerim ku va fikra ji kal û bavan da ji min re ma. Di hunera min

de şopên bav û kalên min hene”
Wênesaza kurd eşkere dika ku ew a di sala 2024an de li gundê xwe pêşangeheka xwe vekê.



Jineka kurdên Anatoliyê bi rengên Dersimî



Şahmaran



Gulên zer



Li ber
Xwedê dayîn





Qıza Nefertiti

KEN

Rojvan Enes

Dilşad, jîyaneke rûtîn dijîya. Sînorên jîyana wî hemû jî dîyarkirî bûn. Lê ji wan sînoran yek jî jê Dilşad xêznekirîbû. Ba ji ku de re hatibe Dilşad bi ya wê dikir. Herî dawî jî ev çûyînhatin bûn qeder jê re û êdî ne dikarî dema borî bîne, ne jî dikarî xeyalên xwe pêk bîne û pê re jî paşaroja xwe bixemilîne. Dilşad di dema niha de girtî bû.

Îro jî wekî her roj, beyî ku alarm lêbide rabû. Telefon hilda û alarm betal kir. Ji bo wî hişyarbûn qet ne zehmet bû, lê dîsa jî çî dibê çî nabe alarma xwe vedikir. Telefon danî û ji şibakê li derwa nihêrî. Tu carî perdeyên xwe nedikişandin. Hez dikir asîmanê temaşe bike. Niha jî biqasî heyranîya ku doh şev li stêrkan dinêrî li rojê, şevqa rojê dinêrî. Jixwe sedema hişyarbûyîna zûtir jî ev bû. Dilşad ev dem ji xwe re

vediqetand û dixwest bi dilekî aram çend daqîqeyan bijî. Di van deman de hertişt ji bîr dikir. Ji bîr neke jî ne xema wî bû. Li van deman tenê ne fikir, hest jî tune bûn. Belê nedixwest tu tiştî hest jî bike. Sedema vê jî ew bû, ku heke wî dilê xwe xweş bikira, jîyanê dê ew ji vî dîmenê jî mehrûm bikira. Loma ditirsî. Nedixwest ev demên ku aîdê wî ne ji destê wî biçin. Ji ber van sedeman di van deman de jê re tenê hebûn dima. Tenê hebûn... Dilşad bi vê razî bû. Hebûn, têra wî dikir. Her tim di dilê xwe de digot, “Bila ev nexweşî, ev kambaxî ji min here ez razî me beyî xweşîyan bijîm.” Ango tenê ne ku hêvîya wî yê xweşîyê şikestibe, ew amade bû ku xweşîyên di destê xwe de jî bide. Tenê ji wî re hebûna wî bima bes bû. Êdî ne xweşî dixwest ne jî nexweşî.

Li saetê nihêrî, dît ku dema kar hatiye. Ji hebûna xwe qetîya û dîsa bû robotek. Robotê ku hemû taybetîyên xwe bi kodan dîyar bûbû. Êdî her tiştê wî dîyar bû. Her tişt dê wekî her rojekî berê bûya. Bermayîyên ji xwarinê berda tiwaletê. Qilêra serçava û devê xwe berda lavaboyê. Pirçên ku hîn keys bi destê xwe nexistibûn serê xwe bilind bikin, serjêkir û ew jî berda qula lavaboyê. Derbasî mitbaxê bû, biqasî ku ber dilê wî bigire hin tişt xwarin û derket. Ev hemû kar divê bûbûyana û loma dibûn. Dema ev tişt dikirin tu tişt nedifikirî. Yan jî tu hest bi wî re çenedibûn. Bo mînak di taştayê de tu carî nedigot “ka ez îro tiştêkî ecêb xweş çêbikim û tahmê ji jîyanê derxînim.” Na, tenê dixwest zikê wî têr bibe û hew. Ew jî ji ber mecbûrîyetê bû. Loma jî dema mirov bala xwe di-de ji xwe dipirse “Çima ev hîn jî dijî?”, “Jixwe tenê biryara mirina wî bi wî re maye, bila bikarbîne qet nebe wê kelîyekî azad bibe.” Sedema vê tam ne eşkere ye. Dibe ku fena hemû jîndaran, dema nêzî mirinê dibe wek refleks dixwaze bijî. Yan jî em dikarin bibêjin di dilê wî de hîn jî piçek

hêvî heye ku ew ji bo xatirê wan li ber xwe dide. Lê dîsa jî niha erebeyek lê biqalibe bawer bikin wê ji şofer re spasîyên xwe pêşkeş bike.

Dilşad ji malê derket û ber bi metroyê çû. Heman rê, heman metro, heman seet... Hewce nake em van deran binivîsin û dilê lehenga xwe teng bikin. Çû ket binê erdê, ronîya ku her sibe temaşê dikir nedikarî têkeve vir. Ronayîya vir çêkirî bû. Wekî xwe. Ji ber wê dema dikete vir bêtir ji hebûna xwe dûr diket. Tenê dibû robotek. Lê wî hay ji vê yekî tune bû.

Di metroyê de ciheke vala dît û rûnişt. Destê wî çû çenteya wî ku berguhka xwe derxe. Lê berguhk li malê bîrkiribû. Ji ber ku doh şev xwest piçek muzîk guhdar bike li xwe hêrs bû. Wê demê bê muzîk dibû lê niha wê çî bike. Di nav evqas mirovî de dê çawa bêhna wî teng nebe. Çavên xwe digirt, dikira ber xwe, li derve dinêrî (ku tenê reşayî bû û di wir de jî teyîsîna mirovan didît.) û ev hemû dubare dubare dikirin. Herî dawî ji vê rîtuêlê bêzar bû û berê xwe da mirovan. Mirovên hejar, ên karker, ên ji rêze, ên robot. Lê

yên robot ji wî ve xuya nedikirin. Yanê helbet xuya dikirin lê wî hay ji wan tune bû, wan jî hay ji wî. Ji ber ku wan di çavê hev de ji bo hev normal bûn, tu cudahîya wan tune bû. Sifte mirovên hejar li ber çavên wî ketin. Jineke pîr, yekê ciwan û zarok. Zarok bi xwe de mîz kiribû. Dilşad li ser vê fikirî. “Gelo çima?”, “Hîn sibe zû ye. Qey di mala van de tiwalet nîne?” Paşê li jinan nihêrî dema ku hejarîya wan baştir dît di dilê xwe de got “dibe ku mala wan tune be?”. Li hember wan ji halê xwe re şikir kir. Serê xwe piçek rakir û li çavên jina ciwan nihêrî. Dema li çavên wê nihêrî hejarîya wê jibîr kir. Dewlemendîyek di çavê wê de hebû. Lê nikarî bibîne ka ev dewlemendîya çi ye? Dema ku jina hejar jî çavên xwe kirin çavên wî, berê xwe guhert û li derve (tarîyê) nihêrî. Di teyîsîna camê de rûyê xwe dît. Wek ku çend sal in, rûyê xwe nedîtibe li xwe nihêrî. Heçku her serê sibe di neynike de li rûyê xwe dinêre jî bêrîyek di dilê wî de çêbûbû. Li çavên xwe nihêrî. Û du çavên hejar dît. Heta îro qet nizanîbû ku çavên wî evqas hejar in. Ji xwe tirsî. Çenteya xwe da ber camê da

ku rûyê xwe nebîne. Ev çenteyek biha bû, dibe ku hejarîya çavên wî ji wî veşêre. Dema rûyê xwe ji camê da alî, çavê xwe bi keçîkekê ket. Lê ket û pê de nûsî. Bi çavên meraqdar li keçîkê nihêrî. Kitêb dixwend. Hay ji derdora xwe tune bû. Dilşad hay ji xwe hebû, difikirî ku dema keçîk awirên wî bibîne wê bitirse. Ji ber wê piçek berê xwe guhert. Nêrînên xwe sivik kirin. Tiştek hebû di vê keçîkê de. Dilşad difikirî “Ev çi ye?”. Li cilê wê nihêrî, şalwar lê bû. Li gor mirovên din ev ciya bû lê ne ewqas jî balkêş. Cotek solê sivik û wek şimikan di lingan de bû. Tilîyên wê xuya dibûn. Wek mirovekî rehet û jixwebawer xuya dibû di çavê Dilşad de. Herî dawî jî tîşort û çaket li çavên wî ket. Tişortekê spî û nexşên qehweyî. Ev nexş bi solên wê ve li hev dihatin. Çaket honandîbû. Kincên keçîke ji yên mirovên din ciyatir bû, lê ne anormal bû ku balê meriv ewqas bikêşe. Tişteki din hebû. Dilşad awirên xwe bir rûyê keçîkê, porê xwe zerikî bû û bi ser xwe de berda bû. Çavên qehweyî di nêçîra hevokan de bûn, wek landîkekî giran giran ba dibûn. Poz piçek bi xûz bû. An-

go em li gor pîvanên bedewîtiya îro binirxînin ne bedew bû ne jî neçê. Dilşad ji bo lêgerîna vê efsûnîyê awirên xwe dîsa ber bi cilê wê ve birin. Ji aliyekî ve jî difikirî ku gelo ew evîndar dibû? Gelo evîn tişteki wisa bû? Lê ev pirs zû ji serê xwe avêt çimkî, ne bi evîne bawer dikir ne jî di he-yata wî de ji evîne re cih hebû. Keçike bi meraqa stasyonê serê xwe bilind kir. Bi vê tevgerê awirên Dilşad dîsa hatin ser rûyê keçike. Keçikê li ekranê nihêrî û serê xwe dîsa ber bi kitêbê bir lê awirên Dilşad destûr nedan.

Keçikê li Dilşad dinêrî. Dilşad her çiqas nedixwest ew bitirse jî nedikarî serê xwe bizivîne. Ji ber ku êdî dîtibû. Ew efsûnîya ku lêdigerî di çavên wê de bû. Ew dewlemendîya ku di çavê jina hejar de dîtibû li vir jî hebû lê ev gelek bû, ne gelek jî, ya rastî bêdawî bû. Aramîyek jê belav dibû. Mirov tê de wenda dibû. Wek Dilşad. Dîsa ji xwe pirs kir “Evevîne?”, “gelo ji ber ku evîndar bûye dem wisa rawestîyaye?”, “kê dem rawestandibû?”. Bi vî awayî gelek pirs ji xwe kirin. Her çiqas dem rawestîya be jî mejîyê wî bi lêzeke ecêb difikirî. Herî dawî

rastî dît. Ev xweşî bû. Ev ruh bû. Belê ev awir gelek xweş bûn û dilê mirov xweş dikirin. Meraqek bi dilşad girt “Gelo dem ji bo wê jî rawestîya bû?” heke ne rawestîya be ev du-sê sanîye wê aciz nakin û dilşad wê bikaribe hîn jî lê binêre. Bi van fikaran Dilşad xwest ku serê xwe bizivîne lê berî ku peyva bigêje mejîyê wî keçik bişirî û germahîyek hat li rûyê dilşad ket. Keçikê dîsa serê xwe danî ser kitêbê. Dilşad nizanî ka ev bişirîn bû yan ken bû. Gelek caran ken dîtibû di televîzyon û telefona xwe de, bi xwe jî gelek caran kenîya bû lê ne wisa bûn.

Ev bişirînek ewqas bihêz bû ku peyva bişirîne jê re biçûk bû. Ji ber wê biryar da ku ev ken e û ji aliyekî jî şikir kir ku ew nekenîye. Çimkî, wê demê wî nedikarî ji wê kenî re peyvekî peyda bike. Tişteke din jî ferq kir. Kenên ku heta îro dîtibûn hemû jî sexte bûn. Heqîqet ev bû. Dilşad fikirî, “Jîyana ku her xweşîyê ji min digire û destûr nade ez pê şabibim, çawa destûr dide ku ev keçik bijî?” “Ev keçik bi eşkereyî xweşîyê belav dike, va ye dilê min di hundirê du-sê sanîyeyan de tije kir.”, “Gelo jîyaneke xweş pêkan

e?”, “Çima niha musîbetek ne-
 ye serê vê keçikê” “Xweşî tenê ji
 min re qedexe ye?” Dilşad bi van
 pirsan serê xwe giran giran danî
 ber xwe. Trên li stasyonê sekinî.
 Piştî ku dilşad siwar bû ev hîn
 stasyona yekem bû. Dilşad heyîrî
 ma ku evqas dereng ajot. Keçik
 rabû ser xwe. Kitêb kir çenteya
 xwe û ber bi derîyê çû. Dema dît
 ku dilşad dîsa li wê dinêre dîsa
 bişirînek(kenek) şand jê re. Dil-
 şad jî xwest bi bişirînekî bersiv
 bide. Lê nikarî, rûyê wî wisa bû
 ku tu dibê qey tirsîyaye. Li hem-
 ber vê devê keçikê piçekî din bi
 ken bû. Ji derî derbas bû û çû.
 Ev ji bo Dilşad ne evîndarî bû.
 Lê ji bilî wê her tişt bû. Hevaltî,
 dostanî, xweşî, başî û hwd. Piştî
 gelek salan hest bi hevaltîyê
 kiribû. Ew keçik di wê kelîya
 kurt de jê re wek heval bûbû.

Dilşad wê rojê bi serîyekî xweş
 çû û hat. Herkes jê re wek wê

keçikê xuya dikir. Li ku dinêrî
 ew didît. Ken ji ber çavên wî
 nedîçûn. Gelek jî meraq dikir ka
 jîyan wê cezaya vê xweşîyê li kê
 bibire? “Li wê yan li min?” Piştî
 gelek salan ev roj dilê wî xweş
 bûbû, aram bûbû.

Serê sibe dîsa bi heman awayî
 rabû. Alarma xwe betal kir û li
 derve nihêrî. Piştî çend sanîyeyan
 çavên wî êşîyan û kelogirî bû.
 Çavên xwe paş kirin û piçek girtî
 hişt. Dîsa vekir û li derve nihêrî.
 Nedikarî, rojê çavê wî diêşand,
 dişewtand. Dilşad fahm kir ku ev
 xweşî jî êdî ji wî çû. Belê êdî di-
 kare wek xweşî bi nav bike ji ber
 ku ji dest wî çûye. Dixwaze biqîre
 û bibêje ji heyatê re ka ew sibe çi-
 qas xweş bûn, lê hewce nake. Ew
 xweşî jî hat û çû. Beyî ku dilşad lê
 xwedî derkeve. Serê xwe ji bacayê
 ber bi odayê zivirand. Xaleke reş
 ji ber wî nedîçû. Serê xwe bi ku
 de biziviranda ew xala didît.

Bayê vejînê

Xizan Şîlan

hespê min yê çeleng
ber bi çirûskên hêviya pêşerojê ve
dibeze
li reştariya siya şevên xewle
şewqa çira dilê xeşîm
dibirîqe
erdên bejî û zîwa
bi gulgenimên zeviya şîn
zîl dan
ji parzûna salên tehl û tirş
şîrê jiyaneke şêrîn
dipale
pêlên wîzewîza
bayê vejînê
di perdeya guhên min de
pistepist in
li meydana şahî û dîlanan
agirê meşaleya newrozê
gur û şên bû
bêhna sosin
û beybûnên azadiyê
ji erdnîgariya axa qedîm
difûre
ax ax welatê bav û kalan
dergûşa Welatê rojê
min
li ser sînga te ya gewr
konê mizgîniya serxwebûnê
vegirt
bejna keç û bûkên serbixêlî

bi rengê fîstanê kesk, sor û zer
xemiland
toza firtûneyên heyaman
li serê zalimên xwînmij
daweşand
xirabî li aşê qencî û dilpakiyê
hêrand
bi tasa spî
ji şureşura kaniya îsyankar
ava berxwedanê
vexwar
li hesretkêşî û bêrîkirina te
mîna mecnûnê sergêj
derbeder geriyam
min
destana helbesvanên nemir
Melleyê Cîzirî
Feqiyê Teyran
Ehmedê Xanî
û eşqa Mem û Zînê
li ser textê şaristaniya te
neqîşand
ez ê
bi sonda tolhildana şervanên mêrxas
bûka xwe ya delal
ji nav deste dêlegurên har
bigrim
bifitilînim
birevînim
rizgar û azad bikim

Maf û erd

Newal Iscan

Bajarên kurdan li Tirkiyeyê herêmên herî kêm veberhênan in. Dewleta tirk bi temamî veberhênanana (yatirimciya) li bajarên kurdan dûr xistiye ku ev yek di dîrokê de diyar e. Îro hemû qadên berdest û sûdmend bi projeyan jinûve veguherîye çavkaniyên qezencê yê dewletê.

Em ê paşê di gotarê de ji nêz ve li vê yekê binêrin. Di dawiya salên 90î de, siyaseta koçberiya bi darê zorê ya dewletê ji rojhat ber bi rojava gelek welatîyên kurd ji newekhevî û cudahiyan aborî yên li welêt haydar kir.

Neolîberalîzekirina bajarên bû sedema dîrxistina gelê kurd a bajarî-civakî-mekanî (socio-spatial) û ev yek jî bû sedema rêbazên nû yên têkoşînê yên bajarî. Wekî din, zêdebûna asta perwerdehiyê û bajarîbûnê, têkoşîna ji bo nasnameya etnîkî ji girêdanên eşîrî û olî girîngtir kir.

Wêrankirin û nermkirina bajarên Kurdan -Pêşveçûna xaniyê klasîk a demdirêj ji hêla TOKI ve

Di sala 2015an de, hema hema hemû şaredarên herêmî yên hîlbijartî yên bajarên kurdan hatin girtin û li şûna wan qeyûmên tayînkirî yên hikûmetê hatin bi cih kirin (*Bianet*, 2016).

Welatîyên xwedî nasnameyeke tirk bûn ku mafê wan yê bingehîn tune. Komek ji serhildêrên xwecihî barîkatên bajarokan ava kirin, bi kevîrên asfaltkirî yên qijkirî bikar anîn, xendek kolan-din û piştire li taxên xwe rêveberiya xweser ragihandin. Ev bûyer di çarçoveya serhildana sembolîk a gelê kurd a li bajarên de mîna Parka Geziyê bû û wêranker bû. Artêşa Tirk a dagirker bi çekên giran êrîşî bajarên kir û bi êrîşên hewayî û hewayî yên bêdem û bêdorveger qedexeya derketina



Kolanek kevn li Sûrê, Amedê (2014). Çavkanî: Ajansa Mezopotamya (MA).

derve pêk anî. Niştecih di jêzemînan de asê man ji ber ku bi hefteyan av, xwarin, elektrîk û guhdana bijîşkî tune bûn. Li ser dîwarên bajêr nivîsên nefret û heqaret li ser kurdan hatin nivîsandin. Gelek sivilên bêçek ji aliyê dewletê ve hatin qetilkirin, lê di çapemeniyê de zarok û kal û pîr jî di nav de hemû wek terorîst hatin nîşandan. Ev serhildan veguherî şerekî navxweyî ku beşdarên herî zêde qurbanî dan, taxên wan bi topbaranê bi tevahî hatin wêrankirin, zêdetirî 355 000 kes ji aliyê hêzên leşkerî ve koçber bûn (OHCHR, 2017).

Vê jicîhûwarkirina bi darê zorê civakek jixwe feqîr xistiye nav zehmetiyek mezintir. Mirovan karên xwe winda kirin û zarakan dev ji dibistanê berdan, di heman demê de malbat ji bo peyda kirina xaniyên alternatîf û erzan têdikoşyan. Hikûmetê ji wan erdan derxistin da ku rê li ber projeyek nûveavakirinê veke ku pir hindik niştecihên berê dibê ku jê sûd werbigirin (*Amnesty international*, 2016).

Dema ku bi perspektîfek berfirehtir tiştê ku bi rastî qewimî, binihêrim, ji min re diyar dibê

ku ji binêve hilweşandina çend navçeyên kurdî yê ku heman şewaza civakî-cihanî parve dikin, wekî siyasetek ji berê plankirî hebû. Dewletê ji berê ve li bajarên kurdan ên wekî Sûra Amedê (ku wek paytexta Kurdistanê tê hesibandin) projeyên veguherîna bajaran hebûn, lê ji aliyê gelê herêmê ve rastî berxwedaneke mezin hat û ev jî leza projeyan sist kir.

Lê belê piştî bûyerên sala 2015an dewleta tirk bi rehetî îmkanên îmhayê yê lezgîn îlan kir. Yek ji herêmên wêrankirî Sûr jî navçeyeke xwedî nirxeke dîrokî ya bilind e ku bi qanûnan tê parastin û xwedî çanda taxê ya kevnar e. Lê belê rojnameyên alîgirê hikûmetê ji bo ku ji krîmînalîzekirin û terorîzmê dûr nekevin, ji bo ku projeyên hilweşandinê rewa bikin, jixwe pêwîstiya ji nû ve avakirina Sûrê derdixist pêş.

Projeyên TOKIyê (saziyên dewletê yê qezenker) bêyî ku niştecih, hawîrdor an dîroka cîhekî li ber çavan bigirin, mekan diguherînin. Li şûna wê, TOKI li kêleka malên nû yê luks ava kir.

Tesîsên geştiyariyê, gotin ku ev ji nû ve avakirina xwaringeh û otêlên nû, dê derfetên nû yê

aborî û bazirganî bide herêmê.

Ew pêvajoyeke jentîfikasyonê ya nedîtî bû ji aliyê hêzên artêşa Tirkîyê ve û ji ya ku bi giştî li bajarên din ên cîhanê weke pêvajoya jentîfikasyonê tê jiyîn cudatir e. Rêjîmê asîmîlekirina bajar bi xwe bi rêya tunekirina çanda wî û guherandina profîla wî ya siyasî kir armanc.

Xelk ev pênc sal in li bendê ne ku vegerin malên xwe, ev xelkê ku hema hema hemû ji çend nifşan li wir dijîn. Welatîyên berê yê Sûrê diyar kirin ku xaniyên nû hatine çêkirin jî bi pereyan nadin wan. Li gorî daxwaznameya ku ji aliyê Midûriyeta Hawirdor û Bajarvaniyê ve hatiye amadekirin, ji xwediyên milkên li Sûrê re çar bijare hatine pêşkêşkirin û gelê Sûrê tevî ku belgeyên milkên welatîyan hebûn jî nikarin avahiyên nû yê li taxên xwe yê berê hatine çêkirin, bikin. Welatîyekî berê wiha got: “Hikûmetê dizanibû ku şênîyên Sûrê nikarin mehane 4-5 hezar lîre bidin, bi mebesta nîrxê xaniyan ew qas bilind bûne. Ji ber vê yekê, gelek malbat hîn jî nizanin ku li ku bijîn (BBC, 2020). Lêbelê, serketiyên rastîn

ên vê projeyê pêşdebirên taybet û TOKI ne, ku bi avakirina ji bo çînen jorîn li ser erdên dewletê pere qezenc dikin.

Serhildanên kurdan berhema pergala sîstemê ye ku bi awayekî neheqî zîrarê dide gelê kurd. Soja (2009) diyar dike ku ramana fezayê di van salên dawî de gelek guherî ye, ji pîvanên fizîkî yê formên sabît berbi hêzek, ku jiyana mirovan figure dide. Ev mirovên jicîhûwarkirî diyar e ji mafê bajar û ji mafê xaniyên ewle, aram û bi arzanî ku mafekî mirovî ye, hatine dûrxistin.

Referansên

Amnesty International (2016).

Turkey: Curfews and crackdown force hundreds of thousands of Kurds from their homes.

BBC (2020). *Sur sakinleri: yeni evleri bize parayla bile vermiyorlar.*

Bianet(2016). *Hangi Belediyelere Kayyum Atandı? Hangi Belediye Başkanları Tutuklu?*

OHCHR (2017). *A UN report details massive destruction and serious rights violations since July 2015 in southeast Turkey.*

Sol (2015). *Star'dan insanlik disi manset: TOKI görevi!*

Soja (2009). *The city and spatial justice.*

Hevpeyvîn

Koçberî û bêwelatî:

Di navbera du welatan da kurik bûn

Adem Özgür

ozguradem25@gmail.com

Lêkolînerên danîmarkî Jimmy Andreasen û Iben Niegaard di sala 1985an de hatibûn gundê Celikan (bi tirkî Kirkpınar, Kulu-Konya) û belgefilmeke girîng kişandibûn.

Jimmy Andreasen û Iben Niegaard ku me bi rêya Arîfê mala Mehmedê Hecî Ranê xwe gihand wan, ji me re behsa dema hatina gundên kurdan, çîroka kişandina belgefilmê û dîtînen xwe kirin.

Di dawîya salên 1970 û destpêka salên 1980an de, her du kesan di rêzebelgefilma bi navê “Zarokên di navbera du cîhanan de” (*Børn mellem to verdener*) qala çîroka koçberên ji Pakistan, Tîrkiye û Yûgoslavyaya berê kiribûn.

Fîlm, hin zehmetiyên aîdbûna du çandan nîşan didin. Li gor derhêneran zarokên koçî Danîmarkayê kirine him Danîmarkî him jî kurd in.



Belgefilm ji van beşan pêk tî:

1. “Ramadan i Danmark”
2. “Familien i Pakistan”
3. “Man skulle tro de var født i Holstebro”
4. “Landsbyen i Tyrkiet” (Beşa li Kirkpınarê)

Di beşa Tîrkiyê da çîroka Remo (13) û Neclayê (12) tê nîşandan. Remo û Necla bi malbata xwe ve li Danîmarkayê dijîn û li havînê terin gundê xwe. Di fîlm da tê xuyakirin ku Remo û Necla diyarîyeke didin pîrika xwe, bi



hevalên xwe re dilîzin û wexta xwe bi hesretê derbas dikin.

Dokumenterên danîmarkî dibêjin, koçberên mêr ên ku li Ewropayê bi cih bûne, di

destpêkê de dixwestin vegerin welatên xwe, lê ji ber guhertina şert û mercan, gelek ji wan vegeza xwe paş xistin e û di dawiyê de malbatên xwe jî bi xwe re anîn e.





Andreasen û Niegaard, serpihataiya xwe ya li Kuluyê veng anîn zimên:

“Wê demê hejmareke mezin a ji karkerên mêr ên ‘biyanî’

pêk tê, ji Pakistan, Tirkiyê û Yûgoslavyaya berê ji welatên xwe derketin û berbi Ewropayê hatin. Heman demê gelek karkerên bîyanî hatibûn Danimarkayê



jî. Karkerên ku hatin vê derê, biryara xwe dabûn ku êdî li van welatan bimînin û dû re hêdî hêdî malbatên xwe bînin vê derê: (Çend salan bi şunda) Hevjîn û zarokên wan hatin Danîmarkayê. Va yeka ji bo me bû bingeş û me xwest em li ser vê yekê lêkolîneke bikin.

Me dest bi projeya rêzêbelgefilmên ku çîroka koçberîyê dike, kiribû.

Hesreta kokê xwe

Me belgefilmek bi navê ‘Zarokên di navbera du cîhanan de’ çêkiribû. Di vê belgefilmê da me qala zarokên di nava du çandan de dimînin, dikir. Va belgefilma me, ji çar beşan pêk dihat. Wek mînak, malbateke kurd/tirk ji gundê Kırkpınarê (Kulu) bûn, wan berî çend salan koçî bajarê Holstebroyê parêzgeha Jutland, Danîmarkayê kiribûn. Va malbata di betlaneyeke havînê de çûbû Kırkpınarê. Em jî bi wan re çûbûn gundê wan.

“Serpêhatiyek û ezmûnek mezin bû”

Çîroka ku em qal dikin, bo zarokên Danîmarkî jî tiştek nîşan dide: Zarokên bîyanî di nava du

welat, çand û cîvakan da çing têne xuyakirin? Lêkolîna me bi alîkariya hin mamosteyên tirk û pakistanî yên li Danîmarkayê û bi hevdîtina bi malbatan re hat kirin.

Çûyîna me ya gundê Kırkpınarê, serpêhatiyek û ezmûnek mezin bû. Beşek ji gundîyan li Danîmarkayê dijîn, beşek ji wan jî li gund bûn. Hinên wan piştî çend salan veşeriyên Kırkpınarê. Di nav wan de mixtarê gund jî çend salan li Danîmarkayê mabû û paşê biryar daye ku veşeriyê gundê xwe.

Hê jî tekîlîya me bi wan kesên re heye. Em di wê belgefilmê da li ser karaktera Remo û Necla sakinîbûn.

Me ji wê demê û vir ve karekî wiha nekir.”

Xebateke antropolojîk

Xêr ji sînemageran gelek rojnamevan, lêkolîner û wênegir jî li gundên Kuluyê geriyên e û li ser entegrasyon, koçberî û jiyana çandî lêkolîn kirin e. Lêkolîner û wênegirê Danîmarkî Niels E. Pedersen ku di sala 1986an de hatiye Celika (Yeşilyurt) yek ji wan e.

Pedersen da zanîn ku wî û hevjîna wî gundê Celikan, Xe-

likan, Kozanli (gundê Tirkan), Şereflî û Bulduk ziyaret kirine.

Pedersen ji me re qala gera xwe kir:

“Ez û hevîna xwe li bakurê Kopenhagê dijîn. Di sala 1986an de, em her du jî li bajaroka Avedøre ya Kopenhagê bi koçberên Tirkîyê re dixebitîn. Ji ber ku gelek koçberên jî Tirkîyeyê li vê derê dijîn. Hevîna min li dibistana herêmi, bi navê Enghøjskolen mamoste bû û ez jî li pirtûkxaneyê herêmi, bi navê Avedøre Bibliotek, pirtûkxaneyê zarokan bûm. Yanê me herduya jî zarokên biyanî nasdikir. Hevîna min di dibistanê de ders dida wan û piştî dersan dihatin serdana min dikirin.

Ya rastî hevîna min xwedan perwerdehiya antropolojîya civakîyê bû û piştîre bûbû mamoste. Loma meraqa wê zêdetir bû û wê dixwest ku welatên van zarokan bibîne. Dixwest here Tirkîyeyê, Anatoliyê bibîne ka jîyana zarok û malbatên wan çing in, ew dê çi dikin... Biya min jî fikreke baş bû.

Me herduyan jî ji karê xwe îzin girt û em çûn Tirkîyeyê. Em du meh û niv li rojavayê Tirkîyeyê geriyan. Me helbet Stenbol, İzmir,

Kuşadası, Antalya, Konya, Enqere û Behra Reş dît. Me li nêzîkî Eskîşehîrê serdana mamosteyên tirk kir (Me hevdû li Fethiye nas kir). Lê me sê hefteyan li Kulu û derdora wê derbas kiribû. Em li gundên wekî Karacadag (Xelikan), Kozanli, Kirkpınar (Celikan), Şereflî, Bulduk û bi taybetî jî li Yeşilyurtê (Celikan) geriyan. Em li Yeşilyurtê li mala malbata Yılmaz man.

Me herduyan jî dersên zimanê tirkî şopandibû, lê me fêhm nedikir. Dema ku gundîyan bi kurdî dengdikir, me nedikarî mela xwe bidin sohbeta wan. Lê malbata Yılmaz bi qasî ku ji destê wan dihat alîkariya me dikirin û di çêkirina projeyê de alîkariya me kirin. Ji malbatê du xort beşdarî wê çîrokê bûn. Bi piranî me bi malbatên ku li Avedøre dijîn re hevpeyvîn dikir. Proje li ser jîyana xortekî li Yeşilyurtê bû û me pêşengehek jî li ser çanda tirk/kurdan avakir. Di heman demê de me gelek *slideshow* li dibistanan nişandabû.

“Rewşa îro ji ya berê baştir e”

Min wêneyên gundê Celikan ya dawî dît. Tiştê ku mela min

Hin wêneyên ji wê demê hatine girtin.



dikişîne rewş, şert û mercên gund ji ya îro baştir e. Di sala 1986an de keçên ciwan li nav gund li dora avê kom dibûn. Li wir bi hev re dengdikirin. Ez tehmîn dikim ku niha di piraniya xaniyan de misluxên avê hene.

Ji bo me pir balkêş bû ku di salona rûniştinê de malbat li ser mînderan rûdiniştin. Dema ku endamên malbatê an jî mêvan dihatin, mirov ji ber hurmeta mezinan li dora xwe digerin, yê herî rêzdar li pî çepê û ciwan li pî rastê rûdiniştin. Û yê herî bi hurmet ji derî dûr, ê ku nêzî derî kêmtir rêzdar bûn. Ez difikirim ku mirovan jiyaneke xweş hebû, lê em di havînê de li wir bûn, ez nizanî meriv zivistanê çing li wir bijî. Min tenê filmên zivistanê dîtine.

Me Kirkpînar jî ziyaret kir, em bi alikariya xortekî li neqewan gerîyan. Dema em dihatin Kirkpînarê rastî êrîşa kûçikekî mezin, kuçikê pez hatin. Kûçikê êrîşî erebeya ku em lê siwar bûn kir. Em beşdarî daweta malbatan bûn. Hevjîna min bi keçan/jinan re govend dikşand û min bi mêran re deng dikir. Me def û bilûr bihîst.



Jimmy Andreasen

Me didît ku jinan di dema avabûna rojê de doşek û balîf ji herîyê pêz çêdikirin. Hevjîna min bi karê hirî, şuştin û tiştên bi vê rengî re eleqeder bû. Me bi keç û xortan ve sohbetên xweş dikir. Bîya min xelkê Yesilyurtê heta hingî gelek biyanî nedîtibûn. Mêvanperwerî li Yesilyurtê pir bû. Me li her gundê mêvanperweriyeke mezin hîs kir.

***Di saya merivê min Arif Yilmaz da me xwe gihand van kesan. Me va mijara siftê di website ya Kurdistan24ê da weşand. Lê bi destura çavkanîyan û bi hin pirsên nû min halê nû ji bo Bîrnebûnê amadekir. Alîyê din em li ser vê mijarê belgefilmek jî amade dikin.**

Romanek ji edebîyata kurdên Anatoliyê:

Li Benda Keskesorê

Rohat Alakom



Dîroka serpêhatiyên kurdên ku sirgûnî Anatoliya Navîn bûne, berê xwe dane Stembolê û koçberî Swêdê kirine hertim bala min kişandiye. Di

navbera van bîst salên dawî de li ser van herêman çend pirtûkên min kurdî û tirkî derketine.

Îro dema em li demografiya hin herêmên Anatoliya Navîn

mêze dikin, em dibînin ku li derdorê bajarên Enqere, Qonya, Kirşehîr, Bolu, Çankirê û hin cihên din bi sedan gundên kurdan hene. Berî salan hatine sirgûnkirin û di dawiyê de ev cîwarên nû ji xwe re kirine warên teze. Dîroka van gundên kurdan gelek caran hatiye ji bîr kirin û derbasî ser kaxiz nebûne. Di sala 1997an de li Swêdê bi derketina kovara Bîrnebûnê hêvîke mezin di nav mirovên ji van herêman de peyda dibe. Ev kovara wek weşaneke hûnerî û çandî li Swêdê derket, heta niha jî weşana xwe li wir berdewam dike. Di navbera salên 1997-2023an de qasî 87 hejmarên wê derketine. Piraniya kesên ku ji vê weşanê re nivîsîne ji nav kurdên Anatoliya Navîn tî. Em bi reqemeke gulover dikarin bêjin ku ev çaryek sedsal e ku kovara Bîrnebûn her derdikeve. Ji bo serpêhatiya kovareke perîyodîk bêgûman ev reqama mijareke şanzî, serbilindî û şabûnê ye. Ev pêşketin û tevgera hunerî, çandî û edebî serboriya navê vê kovara wan jî tîne bîra me: *Bîrnebûn*. Peyva bîr bi taybetî ji bo netewe, gel û komên bêdewlet wek

kurdan gelek tiştan dikare îfade bike. Ji ber vê rastiyê Bîrnebûn bi taybetî di warê berhevkirin û qeydkirina nimûneyên folklorê (edebîyata devkî) kurdî de jî roleke mezin lîstîye/dilîze.

Dema em li hejmarên berê yê Bîrnebûnê mêze dikin em dibînin ku di nav van salên dirêj de bi dehan nivîskar berhemên edebî nivîsîne, paşê hin ji wan ev berhemên xwe wek pirtûk weşandine. Ji nav kurdên Anatoliya Navîn derketina van nivîskaran wek dewlemendî û rengînîkê gelek alîkariya gulvedana edebîyata kurdî li vê herêmê kiriye. Kovar herweha parastin û pêşketina devok/devokên vê herêmê jî dike. Piraniya nivîs û berhemên van nivîskaran bi devokên herêmî hatine nivîsîn. Lê mixabin heta niha qasî ku ez pê zanim devok yan jî devokên kurdên Anatoliya Navîn nebûne mijara lêkolîn û tezên akademîk. Komek nivîskarên ku ev qasî 25 sal in her dinivîsîn, ev in: Mem Xelikan, Nûh Ateş, Fikret Yildiz (navê berê Dr. Mikailî), Seyfî Doxan, Muzaffer Ozgur, Mehtab Îdelî, Yusuf Yeşîloz, Qadîr Çelîk, Şoreş Reşî û kesên din.

Ez di vê nivîsê de dixwazim bi kurtî romana Fîkret Yildiz ya bi navê *Li Benda Keskesorê* (Apec, 2018) bidim nasandin. Ne tenê ev romana Fîkret Yildiz hin kesên din jî çend roman weşandine, wek romana Muzaffer Özgür ya bi navê *Sîyarên Deşta Anatoliyê* (Apec, 2017) û romana Şoreş Reşî ya bi navê *Heco* (Weşanên Ar, 2019). Ev herdu berhem jî li ser Hecî Buxurcî ne ku di nivê yekem yê sedsala 20an de jîyaye. Wî bi komek hevalê xwe li hemberî hêzên dewletê serî hildane, derketine serê çîyan, bûne qaçax û firarê dewletê. Hecî Buxurcî di dawiyê de tê girtin û di sala 1933an de li Enqerê li peytextê Tirkiyê tê dardakirin. Dema mirov van herdu romanên li ser Hecî Buxurcî bide ber hev, rûberî hev bike gelek encamên balkêş dikarin di derbarê çêkirina îmajê wî ya edebî de derkevin holê. Çimkî mijara herdu roman jî heman kes e: Hecî Buxurcî.

Romana Fîkret Yildiz ya bi navê *Li Benda Keskesorê* pêşiyê li Swêdê (2018), çapeke din ya nû li Tirkiyê hatiye weşandin (2019). Beşa yekem ya romanê jî bi heman navî hatiye nivîsîn.

Divê em li vir dîyar bikin ku naveroka vê romanê berê di kovara Bîrnebûnê de wek rêzenivîs bi navekî din *Sîyarê Têrika* derketiye (beşa-1, Bîrnebûn, nr 58/2914). Nivîskar çima ev navê nû: *Li Benda Keskesorê* hilbijartiyê? Mirov vê yekê çawa dikare şirove bike? Belkî jî ev yek bi kesayetiya lehengê sereke yê romanê Os ve girêdayî ye. Os dema ciwan bûye jî gundê xwe aciz dibe, dixwaze bireve, here dîyarekî dût. Li vir nivîskar qala serpêhatîke keskesorê dike ku di nav kurdan de belav bûye. Li gorî efsanekê ger kesekî mêr di binê keskesorê re derbas be, eger mêr be dibe jin, lê jinek bixwaze derbas be, dibe mêr. Os pêşiya benda baranê, paşê jî benda derketina keskesorê dimîne. Berbi keskesorê dibeze-nabeze nagihêje vê pireya efsûnî ku ji “heft rengan” çêbûye. Vê carê jî lehengê romanê Os li dêvla keskesorê projeya çûyîna Stembolê dike pratîkê. Ew li hespê xwe sîyar dibe berbi paytextê osmaniyan Stembolê dibeze.

Bûyerên romanê di sedsala 19an de li derdorê gundê Mîkaîla li hêla Haymanayê û Stembolê

derbas dibin. Roman berheme-ke biyografik dikare bê hesibîn, di vê berhemê jîyana kurdekî bi navê Os heye. Navê Os di devoka kurdên Anatoliyê forma kurtkirî ya navê Osman pêk tîne. Dema mezin dibe di romanê de wek Hecî Osman tê nas kirin. Navên jin û mêrên Anatoliya Navîn hinekî ji navên mirovên li Kurdistanê cihêtir in. Li ser van navên kesan heta niha lêkolînek nehatiye kirin.

Romana *Li Benda Keskesorê* bi kurtenasandina Nûh Ateş, pêşgotina nivîskar û ferhengokekê dest pê dike. Di beşa ferhengokê de hin peyvên ku li gundê Mîxaîla tê peyivîn cîh girtine û bi kurmanciya nûjen watayên wan tîr pêşkêş kirin. Bi dîtina min gelek baş bûye ferhengokê di vê berhemê de cîh girtiye. Çimkî roman bi devoka vê herêmê hatiye nivîsîn.

Guhartinên di civakê de herweha nişên nû jî diafrînin, Di destpêka romanê de, di beşa yekem de dema carekê ji eşîra Têrika komeke mezin sîyar dibin tîr mêvaniya begê êla Mîkaîliya, begê wan Hecîbrêm bi germî û dostanî van mêvanan qebûl di-

ke. Di vî beşê destpêkê de mirov dibîne ku saltanateke biriqî û mezin li vî gundî hebûye û di nav halxweşiyê de jîyane. Nivîskar li vir gelek agahî û zanyariyên etnografîk jî di derbarê kurdên torin û asilzade yêr vê herêmê de pêşkêş dike. Ev demên windabûyî, demên zêrîn di vî beşa yekem ya romanê de gelek tîr romantîze kirin. Mirov wek xwendevan xweziya xwe li van serdemên bihurî tîne.

Nivîskarê romanê Fikret Yildiz bi xwe ji gundê Mîkaîla ye. Ev gund heta sala 1926an bi bajarokê Haymanayê ve girêdayî bûye, paşê di nav sînorên bajarokê Polatliyê de dimîne. Berî vê romanê em di kovara Bîrnebûn de jî rastî gelek nivîsên wî yêr din tîr. Mijara van nivîsan li ser dîrok û çanda gundê Mîkaîla ye. Rêzenivîsên wî yêr di derbarê begê began Elîşan Begê de jî wek mînak gelek balkêş in. Di van nivîsan de di derbarê vî begê kurd de agahî û zanyarên nû cîh girtine. Min ew nivîsan berê bi heyranî xwendibûn. Ev çavkaniyên nivîskar yêr ku wek nivîs weşandine dikarin di pêşerojê de bibin bingehê

romaneke din li ser Elîşan Begê. Berî Enqere bibe paytextê Tirkîyê, li vî bajarî giranîke vî begê kurd hebûye. Fîkret Yildiz bi van nemaye, sala par vê carê di derbarê gundê xwe de lêkolîneke diroki ya fireh jî bi tirkî weşand: *Ankara'da Bir Kürt Köyü: Mikaila* (Apec, 2022, Seksek Yayınları, 2023). Fîkret Yildiz îro yek ji wan nivîskarên herêmê ye naskirî ye. Ew niha li Almanyayê dijî. Wî di kovara Bîrnebûnê de gelek salan navê “Dr. Mîkaîlî” bi kar anîye, lê belê di berhemên xwe yên di van salên dawîn de êdî em li ser bergên pirtûkên wî navê Fîkret Yildiz dibînin.

Wek me li jor jî got romana *Li Benda Keskesorê* li ser jîyana (Hecî Osman Efendi)? ye ku di romanê de wek Os derbas dibe. Piştî di xortaniyê de qezayek li serê wî re derbas dibe, lêva wî didire û di nav gund de jê re “lêvse” dibêjin. Ji ber van nav û nûçikan ew gelek aciz dibe û li ber xwe dikeve. Paşê dema ew diçe Stembolê, ew li wir lêva xwe nîşanî doxtoran dide û lêva wî paşê qenc dibe. Dema ew xort bûye dilê wî dikeve keçeke bi navê Hewê (Hewa Yeho). Lê belê paşê em di dawiya romanê

de dibînin ku Hewê her bedbext e, naghêje mirazê xwe.

Lehengê romanê Os êdî naxwaze di gundê xwe de bijî û bi sîyarî berê xwe dide Stembolê. Dema ew tê Stembolê pirçandiya paytextê Welatê Osmanî gelek bala wî dikşîne. Tê gotin ku li vira “*Heftê heft millet bi hev re dijîn*” û “*bi sedan millet û ziman hewûn*”. Os li Stembolê rastî kurdan jî tê. Bi hezaran kes ji herderê Kurdistanê koçberî vî bajarê mezin kirine. Divê kesekî bi destê Os bigre hebe. Li hemwelatiyan digere. Ew diçe mizgeftê li wir Mele Şewqî Efendî dibîne û serboriya xwe jê re vedibêje bona ew alîkariya wî bikin. Os gelekî dikeve çavên Mele Şewqî Efendî û ew jî vî xortê kurd gelek hez dike. Jê re cihê mayîn û îmkanên xwarinê peyda dike. Di nav demeke kurt de ew dibe şagirtekî jîr û dixwaze here Dergeha hîmdarê terîqata neqşîbendî Mewlana Xalîl (1779-1827) ku wê demê li Stembolê bûye. Ew herdu kurd hev dibînin û qala çend tiştan dikin, wek mînak “*...rola kurdan di belawbûna Îslamê de*”. Os cara pêşîn li vir fêr dibe ku siltanê mezin Selahaddîn Eyubî bi koka xwe

kurd bûye. Os li vir derseke kurt ji Mewlana Xalit Efendî werdigi-re. Mewlana Xalit dixwaze gelek tiştan ji Os fêr bibe, wek rewşa kurdên Anatoliya Navîn, Os jî kîjan eşîrê ye... Belkî jî kokeke Mewlana Xalit jî heta Mîkaîla dirêj dibe, kî dizane. Wî berê jî bîhistiye wekî Os kesekî jêhatî û bikêr e. Bi pêşneyar û alîkariya Mevlana Xalit, Os demekê şunda li Qesra Osmanî dest bi karekî nû dike. Êdî li pêşiya Os deriyên pêşketin û serfiraziyê gelek zû yek bi yek vedibin. Rewşa wî zef baş dibe, êdî piştî wî nayê erdê. Piştî demekê Os li Stembolê gelek tê nasîn û navê wî li Stembolê dibe: “*Kurdê hafîz ji Haymanayê*”.

Os dema gelek pere dide hev, êdî dixwaze ji xwe re xanîkî bistîne û bizewice. Dema carekê ew li xaniyekî digere bona ji xwe re bikire, ew rastî ermenekî tê ku navê wî Kevork Altunyan e. Ji paşnava wî jî mirov derdixe ku ew bi çi karî ve mijûl e. Ew zêrkar e û di sûka navdar Kapalıçarşiyê (Sûka Ser Girtî) de dixebite. Piştî vê hevaskirinê xuya dibe ku ew zêrkara ligel keça xwe ya azep Asparîk nêzîkî wî xaniyê ku Os dixwaze bikire, dimîne. Ew dibin

cînarê hev. Piştî demeke dilê Os û Asparîk dikeve hev û ew paşê dizewicin. Lê belê ev şahiya wan dirêj dom nake, dema em tên dawiya romanê dibînin ku dema bûyîna zarokê, him dayîk û him jî zarok can dane. Xwedê ji bo zarok bêdayîk nemîne “*Herdu hilgirtin bihuşta xu*”. Şîneke mezin dest pê dike, Os tirkiya ku li Stembolê hîn bûye ji bîr dike, bi kurmancî kilameke şîne dibêje: “*Ax felekê te li min çi kir*”. Jina xwe jî wek “*Yêrmeniya min*” û “*Porsora min*” û zarokê xwe jî bi hevoka herêmê “*çêla min*” dide nasîn. Zarok û jinê di gorekê de didin erdê.

Os êdî ji Stembolê dixeyîde, rojekê ji rojan dixwaze ji vir bi dûr bikeve. Ew vedigere gundê xwe yê ku berî 20 salan hîştibû çûbû Stembolê. Di beşa *Os Li Gund* de em wî li herêma Haymanayê dibînin. Gelek wî nas nakin, ew wek tîp zef hatiye guhurîn. Hewê, ew keçika ku berî 20 salan bûbû evîndarê wê, hê nezewicî ye. Paşê Os bi wê re dizewice, lê ji ber gelek sedeman ew dilşahiya ku hêviya wê bû, bi hêsanî nabîne. Os paşê diçe hec, di vegeerê de du kole û carîyekê jî tîne. Navê kola diguhirîne,

navina din datîne. Navê yê reşik datîne Bîlal û yê din Arnes jî Xêro datîne. Ew kole ji Afrîka, Sudanê û Qefqasê bûne. Navê carîyê Atarîs bûye, lê vî navî nagihurîne ...” *ji ber ku navê wê, Asparîka wî ya delal dihanî bira wî*” ku li Stembolê ligel zaroka xwe wefat dike. Kurdên herêmê van biyaniyên reşik û xerîb ev cara pêşîn e di gundê xwe de dibînin û di destpêkê de bi meraq li wan dinêrîn. Ji van Bîlal gelekî xurt bûye, hertim xwestiye bireve, bigihêje azadiya xwe. Nivîskar yek ji wan beşên dawîn

yên romanê ji Bîlal re vediqetîne.

Sal û zeman derbas dibin mezinên gund, rewşa êl û eşîretên herêmê û gundê Mîkailîya jî diguhirin. Lehengê romanê Os ku di destpêka romanê de hê 15 salî bûye, piştî salan êdî mezin dibe û dibe serekê elê. Ev romana Fîkret Yildiz bi van gotinan han dawî dibe: *“Osê Usî Hecîbrêm êdî mezin dibe: Ew bera Hecîbrêma ji Xanedana Mîkailîya hendû bi navî wî têt bankirinê, Mala Osikê...”* Romana Li Belê wek em dibînin romana *Li Benda Keskesorê* bi gelek aliyan ve balkêş e.



Komek Mikailî li zozanan

Min bi kêfxweşîke mezin ev romana Fîkret Yildiz xwend. Serboriya Os ya li Stembolê zêdetir bala min kişand. Ji ber ku di salên 1990an de dema min li ser kurdên li Stembola kevin kar dikir, ez gelekî hewcedarî çavkaniyên kurd yên edebî bûm ku qala kurdên Stembolê dikin. Têkiliyên kurdên Anatoliya Navîn û Stembolê heta berî gelek sedsalan dirêj dibe. Van gundên kurdan bi hezaran keriyên xwe yên bêz dibirin li Stembolê difrotin ji bo hewcedariya goşt ya

bajarê mezin Stembolê bi cîh bînin.

Kurdên Anatoliya Navîn tecrûbe û tevgera çandî û edebî ya Kurdên Sovyetê û Kurdên Swêdê bidin ber çavan. Eger ji wan re îmkana alîkariya dewletê ya aborî û mafê gotina azad peyda bibe em xwendevan wê demê dikarin gelek berhemên ji edebîyateke baş bixwînin. Ew wek lehengê romanê Os divê rêyên xelasîyê yên din bidin pêşîya xwe, eger ew tenê benda “keskesoran” bimînin wê demê zehmet e ew bighêjin armanca xwe.



Henek

Seyfi Doğan

Ramo, tê bîrya te?

– Çi, Haso?

Dema ku mêhlîm tu kut kirî.

– Na! Kîngê, li kê derê?

Mêhlim ji sinifê pirsî. Tûrkiye kê xelas kir?

Te jî dema ku mêhlim berîyê xwe çaxê textî reş kir pêçîya xwe hilda ku bersiv bidî.

Wexta ku mehlîm berîyê xwe çaxê sinifê kir

hemî teleban pêçîyên xwe dînan pêçîya te li hewa me.

Û mêhlim tu rakirî ber textî reş û got; de bê, Tûrkiye kê xelas kir?

Tu demaka dirêj dawestîyayi û te got;

– Bêktaş axa û bêkçî Osman!



99
GOTINÊN
Albert
Einstein

Wergera ji zimanê almanî:
Nuh Ateş

49. Kêm kes dikanin nêrînên xwe yên ji pêşhukimên derdorê cûda birehetî bînin ziman. Hetta piranîya wan qet nikanin bigihêjin nêrînên wengina.
50. Zanyarî ew e ya ku ji ber mayî ye, eger meriv hemû tiştan yên ku wî li dibistanê hînbûyîye ji bîr bike.
51. Ji raborîyê pirtir dahatû min eleqedar dike, çima ku difikirim di wê da bijîm.
52. Hevalek merivek e yê ku meqamê dilê te dinaseye û ji te
- ra wî lêdixe, şayed ku te ew ji bîr kiribe.
53. Gerek e ku ew merivan fedî bikin, yên ku bêşikbirî ji ecebên zanyariyê û teknikê istifade dikin û ji wê qet tiştêkî gihanî fehmnekirî wekî mangeya ku ji gîyazanîyê ya ku wî birehetî dixwe.
54. Mantik te ji A yê digihîne B. Fantaziya te ya te bigihîne her derê.
55. Tiştê ku min ditirsîne ne quweta tarûmarkirinê ya bombe ye,

eksine quweta teqîna dilê me-
riva ya xerabkarîyê ye.

56. Însan îcadkarê bombeya atomî
ye, lê tu mişk li rûyê dinyayê
nikane feqake mişkan ava bike.

57. Ji bo ku bikanibî bibî endamekî
lihevhatî yê keriyek pez, pêwîst
e ku tu berî her tiştî bibî mîyek.

58. Her fehmkirinekê divê ez bix-
we bidestbixim. Gerek e ku ez
ji nûva û ji bini da li her tiştî
binihêrim, bê pêşhukiman.

59. Ez bixwe tevî yên *çûyî* me, lê
hîn li vira me.

60. Ez bi her kesî ra bêferq deng
dikim, ferq nake ku ew kesê ku
bermayîya berehev dike be yan
serokê unîversîteyê be.

61. Em nikanin xwe ji ber rastîye
badin, her kiryarek bi serî xwe
ya ku em bi kar tînin tesirê li
gîştîyê dike.

62. Forma dînbûnê ew e ku meriv
her tiştî wekî ya berê cihbihîle
û bi rûda jî hevî bike ku tişte-
hinek xwe biguhere-

63. Tiştê ku ez hewldidim, evî
hêsan e, bi hêza xwe ya kê-
quwet kirina xizmeta rastî û
edlayîyê ye, bi rizîkoya ku, tu
kes jê razî nebibe.

64. Gava ku hesapkirinên me şaş
derketin, em wê wekî tesaduf
bi nav dikin.

65. Di destpêkê da hemû bîrûray
di xizmeta êvînê da ne. Paşê
hemû êvîn di xizmeta bîrûrayê
da ye.

66. Meriv dikane ku merivekî ji
hundir da serbest û bi wîjdan
tune bike, lê nikane wî bike
kole yan hacetekî kîwir.

67. Şexsîyet ne bi xweşgotinan,
ew bi karûxebat û serkevtinên
şexsî çêdibe.

68. Endustrîya çekdarîyê yek ji
tehlukayên mezintirîn e ji bo
insaniyetê.

.....

Berdewamî heye

Qerfo

Seyfi Doğan

hêza yêkî
hewcîyê
ehmaqîya yên din e

rîya teng
bê dengî
raba û rûne bijî

rewşenbîrê
bêtirs
revîyê bi serî xwe

mütewazîya
ji dil û mêjo da
rewşenbîrî

cesaretdayîna
bawerîyên bi hişa
encamên durust

pes bi cavên xwe ditin
dor alî tarî
ehmaq

qeder
xwe teslîmkirin
exleqê bindestî

zimanên eşkere dikin
bi kincan dixwazin veşêrin
mala minê

Quto

Seyfi Doğan

dîsa
li ser rê
hesên min li davîyê çîyê

gerek mîrov
dest jê berda
li pey bayan

rêvîyê bi salan
insaîyê xwe paraztin
xanî û kanî li cihe xwe

ehmeki
derîyê bê merdîwan
şelafî

lêgerin
dest boş vegerin
derew

îştaha jîyanê
ji xwe re riyê ke dibîne
ajotena xweparastinê

seferî me
ruhê min
li paş min

rîsipîti yê
wek demsalayê
bazar

bi cesarete
ji bilindahîyê ditirse
dilê bêgul

Helbest

di her birinekê da
tameke nemir
dile min hêjand
min hekata aşqê
di tarîyê şevê da
jê re li dawîyê çîyê xwend
derîyê baxçî sîrrê xewnan
agirî êvînê yî berbangî vekir
bifire kevokê bifire
di ser deşt û nevalên me re
serbilind û serbilind bifire
rojê bi ser
petîyên agirî giran jî di bin baskên xwe ke
çavên xwe çar veke
ma bayî teze û zindî
pûsûla te berve rîya azadîyê bike
li kevîyê çemî cenetê
hêlînê xwe ava ke
ma dengî pêlên çemî behîştê yî şevê
çêlên te di xewê ke

Seyfi Doğan

Sirî zivîrok

Bilal Celebli

Va çêroka ez 7-8 salî bûm min jî dîya xwe girt. Dîya min jî bi texmînî, dema ew 7-8 salî bûye, li salên 1974-75an ji cîrana xwe Azîma malê Şamo girtîye. Bi gotîna dîya min, meta Azîme jineka zana û agahdar bûye. Cîraneka dilovan, nîvanperwer û dilgerm bû jî.



Keçikên mehelê carcaran li ba meta Azîmê digehştine hev û guh didane ser çêrokan. Nêzikê 15-20 keçik. Mîna keçikên mehelê bo çêrokan dihatin ba meta Azîme, jinên mehele jî bo şîretan û fikiran dihatine ba Azîmê. Kê derdeka xwe dibûye dihatîye ji meta Azîmê aqil dixwastîye. Xwadê rehma xwe lê bike!



Azîma malê Şamo

Li gundekî du heval hebûn e. Va du hevalana bi dil û can, ji kurikbûyîna xwe pelva li ba hev in û tû caran şer û hing nekirine. Her dem li pişt hevbûne. Zeman derbas diwê û ji du hevalan yek dizewice

Hevalê zewicî, mala xwe bikêf û jîyana xwe hîn rengîn diwe. Çend salan şûnda Xwadê lawikek jî dide wan û şabûna wan qat bi qat zêde diwe. Hevalê nezewicî jî bi şabûna hevalê şa nawe û jê diqare. Sal bi sal ber hêrsa xwe dikeve. Û bi vê hêrsî difikira; "Ez e hevalê xwe bikujim, bi bermalîyê wî ra bizewicim. Ez jî mîna wî xwudanê maleka şên û rengîn bim."

Rojekê herdu heval terin çolê. Li wir hevalê nezawicî, li ber hevalê xwe dadiweste û fikira xwe, xeyalên xwe, planê xwe bi xayînî jê re dibê.

Hevalê zewicî diwê: "Va fikira ne barê aqil û heşa ye! Helbet, rojekê rastî dê eşkere bin, derê ortê kevin. Ez ê bimirim, tu yê ji min naçêtir biwî."

Hevalê nezawicî: "Ka li doralîyê xwe mezeke! Kî heye min eşkere bike?"

Hevalê zewicî, li doralîyê xwe mez dike û diwe: "A ha! va sirî zivîroka her tiştêkî qat ke!"

Hevalê nezewicî dikene û diwê: "Magî vêheşo, sirî çing deng ke?"

Hevalê nezewicî, hevalê xwe dikuje û dike bin axê, defîn dike. Xwudanê malê mirîye, bermalîyê hajê neye. Lê çend salan kemayî malê, xat û beratên malê hevala xayîn dike. Destê xwe ji ser malê heynane. Ji lawikî malê jî mîna bavêkî hez dike, têkildar diwê û xwadî derdikeve. Hevalê xayîn ji demekî şûnda giran giran bo zewacê li ber bermalîyê malê digere. Ji bin dikeve, ji jur derdikeve, li ber dixwîne û li dawî bermalîya hevalê xwe dixapîne. Bermalî jî difikire,

¹ Sirî zivîrok pir kes e bizane, ew sirîya hîşik diwe û wextê ba derdikeve ji kok jêdiwe û mîna top û gogekî li ber bê zivir zivir dizivire.)

"Kesekî min tunne, xwadanê malê çû û nehat bo wê zewaca ji malê ra bixêr e." Û dizewicin.

Hevalê xayîn xewn û xeyalên xwe tên rastî, jîyaneka xwaş dest pê dike. Her tiştêk bo wî gul û gulan e.

Rojekê wexta jin bi mêrê xwe va li ber malê rûniştibûne ba û talasêk radiwe. Sirîyeka zivîrok¹ jî li ber bê dikeve û ji ber malê derbaz diwe. Merik sirî zivîrok diwîne û dikene.

Jinik pirs dike;

"Tu çima dikenî?"

Cara siftê merik diwê, tişt tune. Jinik dikeve pê û serhev pirs dike. Merik bixwe bixwe difikire, pir wext derbaz bû, em zawicinî jî ez qalê heketê bikim, tişt nawe.

Û merik qalê her tiştêkî dike û li paşî jî diwê: "Mêzke sirî çû û deng ne kir"

Jinik jî diwê: "Hîn çi deng bike?"

Jinik her tiştêkî ji lawikî xwe ra qat dike. Lawik jî tê li ber malê qatîlê bavê xwe dikuje. Jinik li laşê hevalê xayîn mêz dike û diwê;

**"Xwûnê kuştîya batil nave!
Te ne go, mezinê here biçûkê rawe!"**

Kurdistana bê nasname

Mehtab Îdelî

Li alîyê me, di nav kurdên Anatolîya navîn de, her wiha di hemû deveran da, piranîya mirovan wekî hev xuya bikin, wekî hev jî tevbigerin, hinek stereotyp hene ku, pergela jîyanê ya rojanê şêntir dikin, ta' mekê didin jîyana rojanê û bi gotin û tevgerînên xwe pergela mêjûyî serûbin dikin. Yek ji wana Zêbik bû.

Zêbikê, her çend xwe astengdar bihesibanda jî, ew jineka jîr û jêhatî bû. Ji aliyê din ve jî ruhekî wê yê hunerî hebû. Wê di cih de li ser rewş, bûyer û mirovan bi mizahî rist û gotin digotin.

Ew, Ema Sazbend û gelek jinên din. Wan ji axê hildide û bêxwendin dizanin. Ew jî dibû wêjeya devkî, ya ku ji devê jinê. Dibû vekirina rêyên tiştên ku di nav civakê de pê pêşîya wan hatiye girtin. Ew, xweîfadekirina wan ya ku hatiye astengkirin bû. Ew der qada sîr û xwestek, xeyal û hestên wan ya ku xwe bidin der, bînin zimên û rihet û serbest lê

bipêyivin bû. Û ew der piranîya wêjeya kurdî bû.

Her yekê derdekî xwe, her yekê bextreşîkeka xwe hebû. Her yekê bi awayekî dianî ziman. Her derd dibû ristek, dibû kilameke devkî. Êdî nema dikarin pêşîya wan bigirin û dijberî wan derkevin. Di civakê de gotinên wan dihatin guhdarî kirin. Ji biryarên wan ra rêz dihatin girtin.

Dema ku apê xwe hat ba Zêbikê û got: “Ez dixwazim tu bi kurê min ra bizewicî.” Wê qet rojekê li dijî apê xwe derneketî û spasdara wî be jî, dîsa jî gotibû: “Na”. Apê dizanibû ku ger bigota “na”, wê biryara rast bidaya. Ji ber ku ew keçikeka bîaqil bû.

Qet deng nekir, rabû ser xwe û xwe da ser rêya mala xwe û ji hêla xênî de wenda bû. Zêbik li pey wî ma. Dizanî ku ji ber qisûrên wê, xwezgîniyên wê qet nehatibûn. Yên ku paşê hatin jî qebûl nekirin. Belkî jî ji ber spas û hurmeta ku ji apê xwe ra dihese

nikaribû ji kesekî din ra jî bigotiba “Erê”. Loma jî qet nezewicî û zarokên wê çênebûn.

Bextreşîya Zebikê di zarokatiya wê de dest pê kiribû. Piştî ku ji dayik dibe, zêde neajo bavê wan rehmet dike. Ji ber vê yekê, bavê xwe ne dibîne û ne jî nas dike. Dûra, pir nakeve navberê dayika xwe jî dimire. Tiştê ku di hişê wê de maye, sirf şîna dayika xwe ye. Digot: “Dema meytê dayika min li ber malê dişûştin tê bîra min, wekî din jî tiştêk naye bîra min.”

Dema ku her sê xwişk û bira sêwî dimînin, apê wan li wan xwedî derdikeve û wan mezin dike. Piştî ku ew mezin dibin, apê wan birayên wan dişîne gundê cîran, şivantiyê, da ku debara xwe bikin. Zêbik û xwişka xwe jî, li mala apê xwe dimînin. Çend sal derbas dibin, apê wan bang li birayê wan dike û dibêje, ku êdî wext hat em ê te bizewicînin.

Terin cem apê wan ê din, kêça wî dixwazin û wan bi hev ra dizewicin. Zêbik û xwişka xwe jî, bi wan ra diçin mala wan û her çar dest bi jiyaneke nû dikin.

Piştî demeke kurt xwişka wê jî dizewice. Bi salan li benda çêbûna zarokê dimîne. Mêrê

wê sebr nake, rojekê diçe û dîsa dizewice. Hewîya ku hatîye ser wê tehemûl nake û hemû keda xwe li pey xwe dihêle û tê mala bavê xwe. Çend sal şûnda bi yekî gundekî Qonyeyê ra dizewice, lê vê carê ew diçe ser hewîyê.

Li wir jî zarokên wê çênabin û di temenekî ciwan de ji ber xemgînîyê dimire. Zêbik bi salan eşkera û bi dizî şîna xwişka xwe dike. Êdî tam biryar dide ku li mala bavê xwe bimê û biraziyên xwe mezin bike. Dibe “Aba” wan û zarokên mehelê. Abekê xwişîrîn, sernerm, dilnizm hînker û henekvan.

Dema digotin:

– Abê, tu çima qet nezewicî?”

Bi yaranî digot:

– Ê serê govendê bi min qayîl nebûn, bi yê boçikê jî ez pê qayîl nebûm.

Carinan jî digot:

– Na ez zewicî bûm, mêrê min pilot bû, teyare gêr bû/ket û mir.

Yan jî:

– Navê mêrikê min Xel bû, Xelî bi bel bû.

Piştî ku pîr dibe, li mala biraziyê xwe dime. Her çiqas ji wê malê û ew emekdara malê be jî, her cara ku li ser sifrê rûdinişt

mîna mêvanan şermok bû. Dema ku bi şev dîsa birçî dibû, li benda ku herkes rakeve û di mitbaxê de xwarinek bi dizî bixwe bû. Ew jineka şanaz, biazil û ya ku haya xwe ji her tiştî hebû.

Di salên nodî de, lawikê biraziyê wê ji ber siyasetê tê binçavkirin û malbat wêran dibe. Piştî ku ew hat berdan û vegeyîya malê, Zêbik rojekê bi dizî tê cem wî. Lawik fam dike ku ew dixwaze li ser mijarê sohbetê bike. Nêzî lawikê biraziyê xwe dibe û dibêje:

– Qet bi ber xwe mekeve, em bi te serbilind in û ez dizanim tu çima xistin hebsê.

– Çima Abê, seba çibû?

Zêbik dikene û serê xwe dihejîne û dibêje:

– Ez dizanim seba Kurdistanê tu xistin hebsê.

Lawik matmayî dimîne. Kurdistan ku carekê be jî me qet ji devê kal û pîran nebihîstiye, ew ji ku derê dizane? Erê, haya wan ji wan deran hebû, lê tenê jê ra digotin, “**Welatê jêrîn.**” Ew jî dema ku behsa etar û denbêjên yên ku ji wir dihatin dikirin, bi kar dianîn. Wan ew wek mîrovên ji welatê jêrîn bi nav dikirin. Ew der, ji bo wan tenê “welatê jêrîn” bû.

Lawik meraq dike û bi heyecan dipirse.

– Abê, tu Kurdistanê ji ku derê dizanî, te ji kê bihîst?

Ab dest bi çêrokê dike:

– Dema ez hîn kurik/zarok bûm, min ji Ebdillê Qursilo bihîst. Ew ji xizmeta leşkeriyê hatibû. Hemû mehele çûn ziyaretê, em kurik jî bi wan ra çûn. Wî ji me ra qala leşkerîya xwe kir, digot:

– Di dema leşkeriyê de ez şandim derekê, bi wir ra digotin “Kurdistan” û xelkê wir jî mîna me deng dikir.”

Birazî matmayî dimê û nikare tişteki bêje.

Tiştêki eceb e, mirov dema çêrokê dibihîze nikare hêsirên xwe bigire. Wî cara sifte navê welatê ku dê û bavên xwe jê hatine sirgun kirin li wezifeka dagirkeran û yên din jî, ji wî bihîstibûn.

Çima welatê mirov ji mirov ra dibe çêrok?

Çima dibe çêrokeke tijî sirr û raz?

Ew çî bû, tirseke çawa bû û çima bi salan ajotibû?

Çima çêroka ku li wir hatibû gotin, careke din qet nehatibû ravekirin û ji me ra nehatibû gotin?

Çima me digot qey ew ji peyva
“Kurdistan” bêhay in?

Çima?

Qeyda Zêbikê ya fermî tunebû?
Çima ew jî wekî welatê xwe
bênasname bû?

Wê sibê wek ku bi grîpê
ketibû ji xew rabû. Dema bûkê
ew dibire tuwaletê, jê pirsî ku ka
hewa î çing e?

Bûkê got:

– Berf dibare, tu çima hewayê
dipirsî?

Got:

– Bo goristanê.

Bûkê got:

– Goristan çî ye lê, tu hevki
grib î.

Dûra pir derbas nebû bang li
birazîyê xwe kir û got:

– Min bibin gund û li kêleka
birayê min binax bikin.

Û çavên xwe girtin mîna ku
rakeve û heta hetayê raket.

Muameleyên şaredariyê bêyî
nasname nayên kirin. Ew ê çir
bikin, ya çing bibe? Nasekî pis-
mamê wan yê ji gundekî cîran,
kamyonek wî hebû. Bi awayekî
mêrik îkna kirin û ji bo xatirê pis-
mam hat. Bêyî ku kes wan bibîne
ew xistin paş kamyonê. Dûra bi
nîvê şevê dest bi rêwitiyeke bi

tirs û xemgîn kirin. Şofer ditirsî,
birazî ferq kir û got: “Netirse,
ruhê wê sivik e.” Paşê çû li paş
kamyonê li kêleka meytê meta
xwe rûnişt û destê xwe da ser. Da
ser ku her çend ji bo demekê be
jî, bila me ji bîr bike ew bi tenê ye
û bênasname ye.

Ew gula ku qet nehatî bîhnikir-
in û ji guliyên xwe qetîyayî bi
nîvê şevê û bi dizî, ji gundê He-
sina ra dibû bûk. Bûka ku wekî
welatê xwe bê qeyd û qamat û
bênasname...

Çend rist û gotinên xweş ên Zêbikê

Di salên şeşti de meriyên xwe bar
Enqereyê dikan. Ji bo ku şîr bidin
zarokan, li wir mangekê dikirin.
Rojekê mangê tê nanî xwesîyê yê
ku nû lêxistî dixwe û li ser vê ye-
ke bûk û xwesî bi hev dikevin.
Zêbik vê mesele dibihîze û dibêje:

Sûltê Sûltê xatûnê

Ji mangê xwe ra benekî bûnê

Ma nexwe nanî Êmûnê

Ma pêşî nehere Macûnê

Sult bûk e, Emûn xwesi ye,
Macûn jî gundeki Enqereyê ye.

Rojekê, dixwaze xarziya xwe ma bi kurê xalê xwe ra bizewice, lê ji ber ku nikare rasterast jê ra bêje, bûyerê bi ristekê ve girêdide û dibêje:

Navî min Êlem e

Destekî min defter, destekî min qelem e

Kî dibê çi ma bê

Ez bûke xalî xwe me

Eylem navê xarziya wê ye.

Rojekê, dibîne ku birayê wê û jina xwe didin dû hev û diçin, dibêje:

Bizîna reş, bi nêriyê hêşîn ve dane dû hev û diherin.

Ji ber ku herdu jî pir reş bûne, qerfên xwe pê dike.

Rojekê, birazîya wê didin mêr/ dizewicînin. Xismê wan jî yekî delodîn e û li cihêz standinê û dawet kirine gelek pîrgirêkan derdixe. Zêbik li ser vê yeke dibêje:

Xisimê me Îs e, îşê me yî pîs e.

Îs navê xwezûrê birazîyê ye.

Rojekê, ji Rabê Elçawîş ra tevnê dirêse. Çend rojan şûnda, Xeca mala Bekî Alê perde dibîne û dibêje:

– Bi xêr be Rabê, te ew pir rind ristiye. Rabik qet qala Zêbkê nake û nabêje ku min ne, Zêbikê rist. Feqet di demeke kut de bûyer derdikeve holê. Zêbik li ser vê dibêje:

Ristîna Zêbkê, pesandîna Rabkê.

Rojekê, mala xwe bar Enqereyê dîkin, cîraneke wan tê malê û dibêje:

– Abê te jî Enqerê hez kir.

Jiyana Engerê pê pir rihet tê û dibêje:

Enqere şûna xewê, şûna tawê

Ew “tawê” bi wateya xwarinê bikar tînê.


Rojekê, yek ji gundiyên wan li Engereyê tê mala wan. Li wir pesnê jina xwe dide û bi tirkî dibêje:

–Şakire, mehekê bi tupekî derbas dike. Zêbik dizane ku di rastiye de bûk pir destbelav e û li ser vê yeke dibêje:

Erê, erê bûkê şîp e, li ber tup e.

Şîp: bi wateya; “jêhatî û şanpaz” tê gotin.

DONATIONER
— VARA MED OCH BIDRA TILL BARNENS FRAMTID —
ALÛKARÎ
— TEVLÎ PÊÏEROJA ZAROKAN BIBIN —



TEKILÎ / KONTAKTA OSS
Mjölmarstigen 1, 163 41 Spånga,
Stockholm, Sweden
E-mail: info@stiftelsenkan.com

Hevkarên me / Våra samarbetsparner

